

BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ★ Sal:6 Hejmar, 2/87 (40)



BERBANG

Organa Federasyona Komeien Kurdistanê Li Swêde
Organ för Kurdiska riksförbundet

Berpirsyar / Ansvarigutgivare:

K. Izol

Serekredaktör / Chefredaktör:

R. Zilan

Redaksiyon / Redaktion:

M. Bekir, J. Kurdo, R. Simo

Karê tekniki / Sättning och layout:

Broye Macit

Navnisan / Adress:

BOX 45205
104 30 Stockholm

Navnisan serdanê / Besöksadress:

Hornsgatan 80, ltr. Stockholm.

Telefon:

08/68 60 60

Postigro:

64 38 80 - 8

Abonetî / prenumeration:

Kes / Enskilda: 100 Skr./sal-år

Meqam / Myndigheter: 200 Skr./sal-år

Agahdarî / Annons:

Rûpele paşin / Baksida: 2000 Skr.

Rûpelî navîn / Inside: 1000 Skr.

Nivropel / Haïva sidan: 500 Skr.

ISSN - 0281 - 5699

Redaksiyon ne berpirsyare nivîsarên bi imze û axaftînê
Federasyonê ye. Nivîsarên ji Berbangê reten şan-
din, heke çap ji nebim, lixwedî nayêng vegerandin.

Bergê pêşin:

Meşa 1-ê Gulanê

foto: Azad

Bergê paşin:

1 Gulan

Cemil

Sal: 6 Hejmar: 2/87 (40) 6.5.1987

NAVEROK

Zor gizêre radike.....3

R. Zilan

Pişt kongra 7-em.....4

K. Izol

Bijî 1-ê Gulânê.....5

Kurtenivîsarek li ser hin pirsgirêkên peyvafirandinê..6

R. Zilan

Bangewaz, daxuyanî.....8

Em lîstikên dijmin vala derxînin.....9

Z. Agiri

Di navê paşin yê sedsala 19-an de rewşa kurdan II..10

Cefîle Cefîl

Cejna Newroz hat pîrozkirin.....12

Rêxistinên jinan piştgiriya pirsa kurdî dikin.....15

Di girtîgeha Diyarbekrê de.....17

Keles

Evîndarê mirovatî u şairekî şoreşger, Mayakowsky.18

Bettal Eziz

Weşanên Nu.....19

Hunermendê kurd Selman Faîq.....22

Faxreddîn Gerdi

Emsal hemu pêkawa cejnî Newrozman pîroz kird...23

Xwendevanên hêja,

Vê carê Berbang di wextê xwe de
dikeve destê we. Ji bo hejmarên pêş
me ji, em dê hewl bidin ku ev prensî-
ba ha berdewam bike û kovara me di
wextê xwe de derkeve.

Di vî hejmarê de ji bo naverokeke
dewlemendtir hinek gav hatin avetiñ.
Nemaze nivîsên li ser rewşa Federas-
yonê, li ser bûyerên li welatê me çêdi-
bin, ji bo vî gavê çend nimûne ne. Lê
ev têr nake. Divê naverok hîn dewle-
mendtir bibe da ku Berbang wek
kovareke bi rêkûpêk giraniya xwe di
nav xwendevanên xwe de biparêze.

Bi van gazin û hêviyên xwe, em li
benda rexne, nivîs û nûçeyên we ne.

Keya Izol

Zor gizêrê radike

R. Zilan

Mirov, di van dawiyen de, li Tirkîyê rastî hin pêşdehatinên seyr-seyr têt. Tevî ku ev pêşdehatin seyr in jî, lê ew bê guman ji rastiyê dizên û iro ji êdî xwe bi zora vê rastiyê didin der. Hebûna xwe tevî pergala xwe ya rastane didine ber çavênu ku heya duhî jî ne dixwestin wê bibînin.

Çiye ev pêşdehatin, bûyer û rûdan? Çi ye ev tiştê ku ji aliyê hinekan ve diyar û xuya, lê ji aliyê hinekên nexwaz ve nedibû ku bihata dîtin. Çi ye ev tiştê çendîn sedsalan û bi vir de ji gelek çavan re xuya, biheq û mafdar lê ji hinek çavan re weke dinamît û bombeke tirsdar û xewrevîn? Ev, ji nişkê ve li Tirkîyê hebûna pirseke bi navê "Kürt meselesi", ango doza kurdî, ye.

Weke ku tête zanîn, ji roja hîmavetina komara Tirkîyê û bi vir de, karbîdestên Tirkîyê di warê pîrsa kurdî de siyaseteke taybetî ajojin. Siyaseteke tûranî û nijadperestî. Li gor vê siyasetê ne bi taybetî li Tirkîyê û ne jî bi gişî li rûyê cîhanê gelekî ku navê wî Kurd be, tune bû. Heke hebe jî, ew ne kurd bûn. Lê Tirkêن çiyayî, Tikên herî pak û xwînsaf bûn. Neyarênen Tirkîyê, destênen derve navê kurd bi qesdi li wan dikirin. Ji ber ku çavênu gişkan li ax û malhebûna Tirkîyê bûn,

Heçî zimanê kurdî bû, ew jî zaravekî zarê tirkî bû. . . Edî gişt zanyariyê dîrokî, cografik, zimanzanî û hwd. Li ser van dîtinên nijadperestiyê hatin firandin. Xwastin ku bi awakî sîstematîf navê Kurdan ji binî ve nehêlin. Vêca her tişt li gor wê hatin rêkxistin û pêkanîn. Çirokên van celeb kir û kirdaran ji me hemûyan re diyar in. . .

Li milekî, iro ev celeb vir û derew, nema dikarin li ber xwe bidin û li hember rastiyê bi ser bikevin. Li melekî din jî, hew kes bi wan dixapin. Ji xwe, ji bo çareserkirina pirsgirêkên têvel jî hew rola dermanbûnê dikarin bibînin. Wisan ku êdî xwedîyên van vir û derewan bixwe jî, ci bigire bûr-jûwazî û ci jî berdevk û dûvikên wan, êdî hew dikarin bervedêriya xwe bikin. Xwe ji sosret û hetiketiya mezîn û kirêt paqîj bikin.

Niha welê xuya dike ku zimanên resmî û yên nîvresmî hêdî hêdî têv vekirin. Ewê hîn ji vebibin. . . Dêna xwe bidinê ci dibêjin: "Edî bes e ev siyaseta han û xwe tevdana me ya weke maman. . ." Rast e. We bi salan serên xwe êxist nav zîxê, lê dûvikên we weke yên maman li derive man. We got: Kurd tune. . . pîrsa kurdî jî tune. . . Lê we heya niha bi

sedan car, bi hezaran welatparêzên Kurd birin ber sêdarê, dan berguleyan. Di zîndanan de, ji ber doza wan ya weke mirovan jînê, rizandin. Bi milyonan Kurd jî mirov nehesibandin, nehîstîn ku hema bi zimanê xwe biaxivin, bistirêñ û dîlanê bigirin. . .

Edî dereng e, hem jî gelekî dereng e. Kurd dibêjin; "Zor gizêrê radike". . . Dewran êdî ne ew dewrane, ku hûn bikarîbin me bi çend waliyan ve idare bikin. Bi çend ordiyên xwe ve me di bin postalên xwe de bipelçîqînin. . .

Di wextê xwe de ji we re hat gotin, ku de werin em weke bira bijîn. Hûn rûmeta me û em jî rûmeta we bigirin. Xwesî û nexweşiyê vî welatî bi hev re biçêjin. Kul û kovanên xwe pêkve û di yek cokê de birêjin. Lê bêfede bû. Di şûna xelatê de we sêdare û zîndan, ço û çomaxêñ bêbab, nexweşî, birçibûn û tunebûna malkambax kirin behra me. . . Heçî iro ye, divê heryek ji me bi xwe bibe mîrê mala xwe !

Riswatî û sosreteke giran, weke boblatekê, hûn dane ber xwe û we bi xwe re dibin. Tiştê ku ji niha ve xuya ye, ew e, ku hûn ê nikarîbin xwe li hember mirovahî û dîrokê rûspî bikin. Dê rûreşî her para we be!

Civîna Meclîsa Skandînavya

Di rojê 22-24-ê Nîsanê de, Meclîsa Skandînavya, ku ji nûnerên welatên Skandînavya; Swêdê, Danimarkayê, Finlandiyayê, Norvêcê û Îslandayê pêk tê, li ser problemên muhacir û multecîyan semînerek li dar xistin. Di civînê de, parlementerên welatên Skandînavya, nûnerên Xaça Sor yên welatên Skandînavya, Amnesty International, rêxistinên biyanî û nûnerên Komîsyona Multecî ya Koma Netewan besdar bûn.

Babeta civînê li ser pirsgirêkên multecîyan li cîhanê û vatinya wela-

tên pêşdeçûyî, bi taybetî jî welatên Skandînavya. Nûnerên hemû welatan diyar kirin wekî divê welatên Skandînavya di alîkariya pîrsên multecîyan de roleke aktivî bide ser milêñ xwe.

Federasyona Komelêñ Kurdistanê Li Swêdê jî di vê civînê de besdar bû û di xebatêñ grûbî de tevî karûbare semînarê bû. Nûnerê Federasyonê, bi gelek parlementerên besdar re têkîlî danî û rewşa Kurdistanê ya îroyîn ji wan re da kivşê.

Di hejmareke din de emê bi firehî behsa vê civînê bikin.

Semînerek

Li ser zimanî kurdî

Di roja 11.4.1987'an de, Komela Kurdistanê Li Spangayê semînerek li ser pîrsa "pronavan" di zimanê kurdî de amede kir. Semîner ji alî endamê redaksiyona Berbangê Reşid Simo de hate dayin. Di semînerê de dora 50 kesan besdar bûn û bi serfirazî derbas bû.

Pişt kongra 7-em

K. Izol

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê kongra xwe ya 7 em çêkir. Wek hersal îsal jî kongra me bi gelek aliyan ve bi hereket derbas bû. Bi vî kongreyê, Federasyon sala xwe ya 7-em tije dikir. Hemû kurdên ku xebata Federasyonê ji nêzîk ve nas dikin, dizanin ku xebateke wisa bê dijwari nabe. Ji gelek aliyan ve dijwariyên me hene. Her çend dijwariyên me naqedin jî em dikarin bibêjin hersal kêm-tir dibin. Federasyon hêdî hêdî ber bi bingehêke hêztir û baştir dimeşe. Lê pirsên me dawî negirtiye.

Pirsa giringirîn ku li ber me hemûyan heye, ew e ku em dê çawa bikaribin Federasyonê bikin malê hemû kurdên li Swêdê dijîn. Emê çawa ser-bikevin ku Federasyon ji alikî ve hemû kurdan temsîl bike, bi pirsên wan mijûl bibe, xwedî bîr û bawariyê bibe, ji bo halkirina wan pirsan gavêن hêja û cih de bavêje. Her wisa dê Federasyon çawa bikaribe piştgiri û yarmetiyê hemû kurdan bistîne û bi dehan, sedan kesen qadro di bin baskê xwe de bicivîne ji aliyê xebatê de piştgiriya wan i aktif bistine. Ev her du aliyên giring ya xebatê demokratik e. Gava herdu alî hevûdu temam neke, karên demokratik ji holê radibe.

Heta îro adeteke nebaş di xebatê Federasyonê de peyda bûye. Paş kongran piraniya kurdan çûne mala xwe li benda xebata Komîta Kargêr ya nûh sekinine û zû bi zû nêzîkî xebatê rojane nebûne, piştgiriyên xwe ya aktif nîşan nedane heta carnan xwendî li Federasyonê derneketina. Hemû karûbarêni Federasyonê ji ber vê yekê ketiye stûyê çend kesen endamê Komîta Kargêr. Pir caran encama vî,

nexebitandina organan yan ji fetisan-dina kar û bar bi xwe re anîye. Gelek vekiriye ku çend kes bi serê xwe nikarin ji bin xebatê Federasyonê derkevin. Çarçewa xebatê Federasyonê roj bi roj firetir dibe, bi sedan pirsên nûh derdikevin pêsiya me. Carnan divê hemû hevalên Komîta Kargêr û wekî din gelek hevalên alikar, şev û roj bixebeitin da ku bikaribin ji bin van baran derbikevin. Carna ev bilem têr neke. Divê ji derve ji alikarî bê kirinê, hevalên bi tecrube bikevin nav xebatê.

Gotin û nivîsandina fîkrîn wusa êsan e. Lê daxistina wan i pratikê pir dijwartir e. Lê ji ber ku ev pirsa me hemûyan girêdide, divê ji vî re halek ji bê dîtin. Halekî ku ji bo hemûyan derbas dibe, ku piraniyê girê dide.

Dîtina min halkirina vî meselê ne ew çend dijwar e. Bêşik ger xwestin hebe.

Berê her tiştî divê em Federasyonê wek rîexistinek demokratik qebûl bikin. Qesda min bi gotina demokratik ev e ku, xwestin û raya piraniyê endaman, organan, nûneran e. Ev pirensîba divê bê kêmâsi were cih. Herkes li gora xwestina piraniyê hereket bike. Prensîba duduva jî, eger biryar yan organen Federasyonê li gor xwestin û raya me ne be jî, em bikaribin vatiniyê xwe yê muxalefetê bînin cih. Di xebatê demokratik de ev herdu tişt ji nêzîk ve girêdayî hevûdu ye. Ger muxalefeteke baş û cidî, rexne ji bo pêşdebirina kar û bar nebe, kesen ku di ïdarê de ne, dikarin bi her awayî weka xwestin û daxwaza xwe bikin. Xebat dikare li cihê xwe bijmêre, kes ji kesî hesab nepirse.

Navbera 2 kongrayên giştî du, sê

organen esasî hene. Komîta Kargêr, Komîta Giştî, Komîta Çavdêr, civî-nîn komelên endam. Ev mekanîzma hem rî dide muxalefetê hem jî rî dide rexne û pêşneyarênen nûh. Ev bingeha xebata demokratik pêk tîne. Herkes, dikare li gor bîr û baweriya xwe tesîrî li ser xebatê bike. Ev maf û vatini-yê herkesî ye.

Lê, ê me heta niha bi awakî din meşyaye. Piştî kongran, herkes çûye mala xwe û rexneyên xwe, yan jî dîtî-nîn xwe li ser hev civandine û li benda kongra dinê sekinîne, ku paş sale-kî dîtîn xwe bikaribin bînin zimên.

Ev metoda her çend di nav me kurdan de cih girtibe jî, metodek ne di cih de ye, tu' car tu fêde nade ji bo xebatê demokratik.

Lê, divê em baş bizanibin ku ev kêmâsiya me hemûyan e. Ji destpê-ka avabûna Federasyonê heta îro ev kêmâsiya bûye astengeke mezin li ber Federasyonê.

Heta ev astenga ji holê ranebe, Federasyon weke rîexistineke demokratik bingeha xwe xurt neke, nikare bibe sazûmaneke kurdî jî. U rîexistineke bingehfire ku dixwaze hemû kurdên Swêdê temsîl bike, ji hemû perçen Kurdistanê nuner tê de hene, xwe neke sazûman, nikare wek rîexistin jî xwe biparêze. Zû an dereng mahkumê têkçûyînê ye.

Helbet xwestin û hêviya me tucar ne ev e. Divê Federasyon wek sazûmaneke kurdî netewî û demokratik jiyana xwe bidomîne, bingeha xwe firehtir, hêz û otorîta xwe xurtir bike. Divê em hemû bi hev re ji bo vê armancê bixebeitin.

BIJÎ 1-Ê GULANÊ



Îsal jî karker û gundiyên Kurdistanê di roja 1-ê Gulanê de nikaribûn ala karkeran bilind bikin. Dagirkerên hov, ev roja hevgirtina karkeran li welatê me qedexe kirine. Bêgoman sedema vê yekê tirsa wan ji xebatkaran e.

Lê ew dijminên mirovaniyê çiqas rojén weha li gelê me qedexe bikin jî, nikarin pêsiyê li têkoşîna demokrasiyê û azadiyê bigrin. Ew bi hezaran mirovên ku ro di zîndanan de, di bin êşkênciyêngirân giran de ne, ala azadiyê ji destêne xwe bernadin, vê yekê başêspat dikan.

Welatparêzên kurd ku li welatên Ewropayê dijîn, di meşen 1-ê Gulanê de bi xurtî besdar bûn, û dengê xwe li hember dijminên mirovatîyê bilind kirin. Li Swêdê jî komelên endamên Federasyonê tevî endamên xwe ve di li bajarên ku tê de rûdinîn, bi xurtî di meşen 1-ê Gulanê de besdar bûn û bandrolên li dij hukumatîn dagirker bilind kirin. Belavoka ku Federasyonê li ser rewşa Kurdistanê hazir kiribû, bi hezaran li xelqê Swêdê belav kirin. Li bajarê Stokholmê jî welatparêzên kurd di bin bandrola Federasyonê de, di meşa VPK de bes-

dar bûn. VPK rê da ku Federasyon di civîna 1-ê Gulanê de axaftinekê bike. Pişti axaftina Federasyonê, Koma Govend dîlanê kurdî pêşanî

bi hezaran besdarên meşê kir.

Li jêrê em axaftina Federasyonê di 1-ê Gulanê de pêşkêşî xwendevanên xwe dikan.

Demokratno, aşitîxwazno, azadîxwazno, komunîstno, Gelê kurd ro di bin zordeskiyeke gran de ye. Bajar û gundên li Kurdistanâ Iraqê û bûne meydana şer di şerê navbera herdu welatan de. Bi hezaran mîroven bê mudefa û bê guneh jiyana xwe winda kirine. Gelek gund jî holê rabûn. Rêjimên herdu welatan li dij gelê Kurd polîskayeke nemîrovî dajon. Bê ku emir û cinsê mîrovan bûnin berçevan, wan bê mehkeme êdam dikan.

Rêjîma Baas li Iraqê cardin dest pêkir û bombêngazê li hember gelê kurd bi kar tîne. Heta niha bi hezaran mîrovan jiyana xwe winda kirin.

Polîska rejîma Turkiyê jî wehaye li hember gelê Kurd. Li alikî operasyonên leşkerî li Kurdistanê pêktînîn û li alikî jî biryar dane ku 9- mîrovî li hemû Turkiyê, cî û warê wan bigûhîrin. Piraniya wan kurd in.

Tenê li mintiga Dersimê, ku bi ser-

hildana xwe ya qehraman navdare, 234 gundên kurdan têna vala kirin. Turkiyê tenê bi êrişâ li Kurdistanâ Turkiyê ne raziye. Rêjîma wê ya barbar bes sal du car êrîşen giran birin ser Kurdistanâ Iraqê û gundên kurdan bombe kirin.

Ev rêjîmên Iranê, Iraqê û Turkiyê yên kevneperest bi kirinên xwe hebûna gelê kurd têhdît dikan. Ev politika jenosid li ber çavê cîhanê pêk tê. Hemû peymenten navnetewî ku mafê mîrovan ya jîyanê garantî dikan, ji ali van dewletan de tê xistinî bin lingan. Tişteku mirov berxwe dikeve ev e ku welatên ku li bin peymanen navnetewî mze kirine, li jîholêrakirina nete-wekî 20 milyonî bêdeng temâse dikan.

Em bangê hemû hêzên demokrat û pêşverû dikan ku vê bêdengiyê bişkênin û politika jenosid li hember gelê kurd bidin sekinandin.

Kurtenivîsarek

li ser hin pirsgirêkên peyvafirandinê (1)

R. Zilan

Herwek tête zanîn, peyv di zimanê kurdî de bi çend awayî hatine li hev siwar kirin û afirandin. Gava mirov li pekhatina peyvîn ku milet û bi afirandine hûr dînihêre, dibîne ku ew pêkhatin kêm-zêde bi hin qaïde û qanûnan ve girêdayî ne. Nasîn û dîtina wan qaïde û qanûnan rê li ber me vedike, ku em li ser bingehêwan hin gotinênen nû li hev sûwar bikin. Peyvîn nû yên pêwist biafirînin û têxin zimanê xwe. Bêî dêanaxwedana van qaïde û qanûnan afirandina peyvîn nû ne hêsan û gengaz e. Yan na, peyvîn ku têne afirandin, dê ji bingehêwan zimanê kurdî re biyanî bin. Dê nekevin qalib û çerçewa destûra zimanê kurdî. Ji lewra jî pêdîvî ye, ku mirov berî her tiştî wan qaïde û qanûnan binase û bi dû re xwe bide kareki holê.

Çi ne ev qaïde û qanûn? Çi ne ev rê û awa? Bersîvîn van pîrsan, bê guman, bi taybetî bi zanista zimanê kurdî ve û bi giştî jî bi zanista zimanî ve girêdayî ne. Bêî hebûna zanyariy-ekê hûr û kûr, bêî nasîna bingehêwî zimanî mirov nikare ji bin pîrs û pis-girêkên dijwar derkeve. Ji dongî û encamên ku derketine meydanê bi piştarstî behs bike.

Heçî zimanê kurdî ye, çî û kîjan zaravêwî dibin bila bibin, heya niha ji lêkolîneke têkûz û rêkêpêk bêpar e. Hoy û sebebêwî yekê, herwek tête nasîn, rewşa ku Kurd tê de jiyan e û hîn jî tê de dijîn e. Ne pêwist e, ku em li vir ji vê yekê kad bikin... Ji ber tunabêna lêkolîn û lêhûrnêrinêholê jî, bi taybetî li ser zimanê kurdî danîna hin qaïde û qanûnen bi giştî rezimanî û bi taybetî jî morfolojîk, ne mumkun e. Ji lewra jî, rastir e, ku

mirov di gehîneka iro de ji qaïde û bingehêr rezimanî yênzaravê cihê cihê behs bike. Jixwe şaş e, ku heya karakterên taybetî yên zaravan yek bi yek dernekevin ber ronahiyê, mirov hin qaïde û qanûnen zimanê kurdî yên hevbes, ku ji bo zimanê kudi bi giştî derbas dibin, tesbît bike. Jiber vê yekê jî, me di van çend nivîsan de daye ber xwe, ku em bi tenê li ser hin pîrsen morfolojîk yên zaravê kurmançî (kurdiya jorîn) rabiwestin û bigihêne encaman. Lê bê guman em ê wan gelek caran bi yên kurdiya soranî/mukrî (kurdiya jérîn) ve jî bidin ber hev. Cihêtîyên ku derdikevin pêsiya me, raberî xwendevanan bikin.

Heya niha li ser di zaravê kurmançî de peyvafirandinê zêde tişt nehatine nivîsandin. Tiştên heyî gelekî hindik in. Gelek ji wan jî şaş û çewt in. Vê qavê em bi xwe ne di wê idîayê de ne, ku em ê tiştêkî gelekî rêkûpêk û lêkolîneke gelekî têkûz berpêşî we bikin. Lê, herwek ji sernivîsara vê bendê jî xuya ye, em ê bi tenê li ser hin pîrsîrêkan rawestin. Çend qaïde û qanûnen ku bi taybetî morfolojîk in, bidin ber çavên we.

Hin rê û awayên peyvafirandinê:

Peyv di zimanê kurdî de, ne bi tenê di zaravê kurmançî de, bi çend awayî têne afirandin. Peyvîn afirandî, bi pêş yan jî paş peyvî ve girêdana hin pirtik yan jî peyvan ve pêk hatine. Anglo yan pêşpîtikek (prefix) yan paşpîtikek (suffix) û yan jî peyeke nû bi pêşî yan jî bi paşıya peyvî ve hatine girêdan. Bi vî rengî peyvîn afi-

randî hatine bi dest xistin. Vêca ew peyv bûne xwedî mana û naverokeke taybetî û nû, ketine xezîna peyvîn kurdî û ew dewlemend kirine. Da ku em bikaribin zimanê xwe pêşde bibin,, geşe pê bidin, wî li gor pêşdeçûna jînê biguhirînin, dewlemendtir û nûnjentir bikin, divê em qilawiziyêndi pêkhatina peyvîn ku milet li hev siwar kirine de bibînin. Ew qilawizî rê û awayan, ku mirov di gişt zimanîn de dibîne, ji lêkeran (verbum) sûd wergirtin û istifade kirin e.

1) Heçî lêker in, ew di zimanê kurdî de jî roleke gelekî mezin dilizin. Lêker, ne bi tenê bi karê lêkeriyê ve radibin. Lê di gelek warê din de jî, ew weke avxizkekê, peyvîn têvel têvelî dizên. Nemaze wek rengdêr(adjektîf) û navdêran (substantiv). Em bi aîkariya koka(reha) dema niha (present stem) û heweha bi aîkariya koka dema bihûrî (past stem) û raderên lêkeran dikarin pêkhatinê û konstruksiyonê û li dar bixin. Em ê li vê jérê bi aîkariya koka dema niha ya lêkeran hin peyvîn ku hatine afirandin berpêşî we bikin.

Xwastin

Koka vê lêkerê ya dema niha xwaz e. Ev paşpîrtik ji bo mebesta "doz kirin, xwastin, divêtin" -ê tête bi kar anîn. Ew bi dawîya ci peyvî ve bête nûsandin û zeliqandin, dide zanîn ku divê meram û mebesta bi vê peyvî ve girêdayî bête cih. Wek:

Deynxwaz:

"Kesê ku deynêxwe dixwaze.

Aştiwxwaz:

Kesê ku aştiyêdixwaze û ji bo wê têdikoşe.

Cengxwaz, şerxwaz:

Kesê ku şerût e û dixwaze şer bike.

Qencîxwaz:

Kesê ku qencyî dixwaze û ji bo qencyî dibizive.

Rizgarixwaz:

Kesê ku rizgariyê dixwaze.

Tolexwaz:

Kesê ku dixwaze heyf û toleya xwe hilîne.

Azadîxwaz:

Kesê ku dixwaze azad û serbestbiye û ci zorkerî li ser nemîne.

Karxwaz:

Kesê ku li kar digere û dixwaze ji xwe re karekî bibîne û pê ebûra xwe bike

Aramîxwaz:

Kesê ku dixwaze di aram û hizûrê de bijî û ci teqereqek nebe û neqe-wime.

Dilxwaz:

Kesê ku dixwaze tiştekî ne bi zorê lê belê li gor xwaztina xwe ya ji dil û can bike û wî bîne cih.

Xerabixwaz, bedxwaz:

Kesê ku xerabî û bediyê dixwaze û dixwaze ku tiştên ne bêni serê mirovî

Daxwaz:

Tiştê ku mirov doz dike û xwesteka mirovî ye, ku mirov dixwaze ew bête cih.

Dozxwaz:

Kesê ku li doza xwe digere û dixwaze neheqiya ku lê hatiye kirin, bête eşkre û riswa kirin.

Nihêrîn:

Koka dema niha ya vê lêkerê nêr e. Wekji radêra lêkerê ji xuya dike, ev paşpirtik jibo mebesta "lênihê-rîn"-ê tête bi kar anîn. Eger ew weke paşpirtik bi peyvekê ve bête bestin, dide zanîn ku divê mebesta bi wê peyvê ve girêdayî biqewime û bête cih. Wek:

Çavnîr:

Kesê ku çavên wî li riya tiştekî yan ji kesekî ne û ew ji bo hatina wî/wê dipê.

Panêr:

Kesê ku dipê û li tiştekî dinihêre da ku çitiştek nêhete serî û da ku ew tiş welê parasî bimîne.

Zaroknîr:

Kesê ku li nexweşan dinihêre û sex-bîriyê li wan dike.

Lêhûrnîr:

Kesê ku li pirsgirêkekê dikole, pirsên heyî derdixîne meydanê û li wan hûr dinihêre.

Gotin:

Koka dema "gotin"-ê tête bikar anîn. Ew bi dawiya ci peyvê ve bête nûsandin, dide zanîn ku qabiliyeta mirovî ji bo bicîhanîna mebesta bi wê peyvê ve girêdayî heye. Wek:

Çirokbêj:

Kesê ku dikare çirokanbibêje.

Stranbêj:

Kesê ku dikare stranan bibêje.

Gotubêj:

Munaqaşe, giftûgo, danûstandin.

Dengbêj:

Kesê ku dengê wî xweş e û dikare stranan bibêje.

Xweşbêj:

Kesê ku axaftin û sohbata wî xweş e û dikare bi peyvîn xweş wexta mirovî derbas bike.

Bihabêj, qlymetbêj:

Kesê ku ji nirx û bihayê tiştan fêm dike, dikare wan binirxîne û bihakî biavêje ser wan.

Dîtin:

Koka dema niha ya vê lêkerê bîn e. Ev paşpirtik ji bo merem û mebesta "dîtin"-ê tête bi kar anîn. Gava ew bi dawiya peyvekê ve tête girêdan, dide zanîn ku mebesta bi wê peyvê ve girêdayî, dihete cih. Wek:

Dûrbîn:

Tiştê ku mirov dide ber çavên xwe û pê dûrahîyê dibîne. Kesê ku pêşerjê ji niha ve dibîne.

Çakbîn:

Kesê ku rewş û haleta heyî ji bo qewimîna tiştên gelekî bas û çê dibîne. Jê hêviyeke gelekî mezin dike. Anglo optîmîst. Ev peyv bervajiyê bedbîn e.

Bedbîn:

Kesê ku rewş û haleta heyî ji bo qewimîna tiştên gelekî pîs û xerab dibîne. Jê hîç hêviyeke naake Anglo pesimîst e. Ev peyv bervajiyê çakbîn e.

Hûrbîn:

Kesê ku tiştan bi serûberî dibîne, wan bi awakî zîz ji hev derdixîne, love dike û rê dide ber mirovî.

Kûrbîn:

Kesê ku dadikeve bingeha pirsgirêkan. Hoy û sebebênu ku rê didin wan, bi xweşikî dibîne û berpêş dike.

Rastbîn:

Kesê ku objektîv dinihêre. Büyer û pirsgirêkan, weke ku hene, dibîne û wan raberî mirovî dike.

Kurtebîn:

Kesê ku nikare dûr û pêşerojê bibîne û rewşa ku pêva girêdayî ji hev derxîne.

Xwarin:

Koka dema niha ya vê lêkerê xwar e. Ev paşpirtik ji bo mebesta "xwarin"-ê tête bi kar anîn. Eger ew weke paşpirtik bi peyvekê ve bête girêdan û bestin, dide zanîn ku divê mebesta bi wê peyvê ve girêdayî, bête xwarin. Lî, ev yeka han, helbet gelek caran ji bo mana mecazi ye. Wek:

Xwînxwar:

Kesê ku barbar e, xwîna xelqê dirijîne û wan dikuje û vedibirîne.

Xemxwar:

Kesê ku xema tiştekî dixwe, dikeve paxavê û xemgîn dibe.

Malxwar:

Kesê ku mal û hebûna ku ne heqê wî ye, dixwe û dimezixîne.

Diravxwar, perexwar:

Kesê ku peran dixwe, wan bi awakî jirêder dimezixîne û serf dike.

Mirovxwar:

Kesê ji bajarvaniyê dûr, barbar û xwînxwar. Herweha kesê ku mirovan dixwin, ango kanîbal.

Kedxwar:

Kesê ku renc û keda desten mirovî dixwe, xwîna mirovî dixwe û mirov hejar dihêle.

Pêmahîxwar, bermayîxwar:

Kesê ku pêmahîya (mîrat, mîras) ji mermal, ji dêubav mayî dixwe. Terâl, bêkêr ê bêxêr e û desten wan hertim li ser zikê têr in.

Bermaxwar, bermayîxwar:

Kesê bêrûmet yê hinde bêqiyem e, ku ji mirovan nahete hesêb. Ne bi xwarina rastî, lê bi tiştên ji ber xwarinê mayî ve zikê xwe têr dke. Wek hestikojan e, ango kuçik e.

Berülxwar:

Kesê ku bertîlan dixwe û karê xelqê bêl bertîl nahêne cih.

BANGEWAZ

Rêjimê faşistê Baas li Iraqê destpê-kiriye û bombê gazê li hember gelê kurd bi kar tîne. Her ku dawiya diktatoriya Saddam nêzîk dibe, êrîşen wî jî li ser gelê kurd girantir dibe.

Di van rojêna dawide nameyek ji

Ji bo hemû Miletê Kurd li cîhanê, Ji bo hemû law û keçen Milletê Kurd li cîhanê, Ji bo hemû Kurdên bi şeref û namûs li Iran, Iraq, Turkiyê, Sûriyê, Lubnan, Soviet, Efxanistan, Pakistan û li Urdun.

Paş Silavên Germ ş bratî, em dixwazin we agadarbikin:

Hukumeta hov, qatil, û faşist ya Saddam Husseyin, li Iraqê, dest bi kuştarekê gişt

û bê sinûr kiryê li Kurdistana başûr. Ew jî bi kar anîna çekênêmî û bombê gaza bi jahr li piranya gund û navçen Kurdistana Iraqê, bi armanca têkdan û nehiştina hebûna milletê Kurd.

Rêjîma imperialist û dagîrker ya baasê eflaqî dest bi xirabkirin û şewi-

tandina piranya gundê Kurdistana Başûr kiryê û bi hezaran xelkê wan bi zorê dibe xwarî Iraq û ser sinûrê Urdun, û xelkê ereb tîne Kurdistanê. Di wî xwextî de ko li serserê nehiştina gelê Kurdistan, bi Kurd, Turkmen, Aşûrî, musulman, Fileh, û Yezidî, berdewame.

Ji bervêya, em bi xurtî bangî we dikan ko hûn bi hawara brayê xwelî Kurdistana Başûr bêñ û bi hemi renğî alikarya me bikin. Bra û gelê we li Kurdistana Iraqê di bin tirsa nemâne de ne.

Vî karê havîfî û ne-insanî, ji alî rîjîma faşist li Iraqê, pir bi xurî mehkûm bikin. Xwepêşandan (demonstration) û karê protesto rêkxin. Dawa li hukumetê Firansa, Amerika, Almanya rojava, Italia, Soviet, û

sekreterê giştî Yekîtiya Niştimanî Kurdistan Celal Talabanî kete destê me. Nama ku gi hemû kurdare hatîye nivîsin, em li jîrê pêşkêşî xwendevanen xwe dikin.

Misir bikin ko çek nefroşinjrêjîma faşist li Iraqê. Xwe rêkxin û koma çêkin bo tole û heyf standina, şehîdên brayê we li Kurdistanê, ji qatilên baasî re.

Koçke her, Saddam Hussein, şerî nemana milletê Kurdi lan kiryê. Hûn jî wî şerî bikin şerî pîroz ji bo nemana hovê s Saddam, Baas, û faşîm.

Em lihêvya alîkarî, piştgîrî, û hevxebatya we ne û em dizanin ko mîlletê meyqareman û bi şaraf, li hemû perçen cîhanê, qisûr nakin.

Bijî Kurdistanek azad, demokrat, û gehîştî bi mafe çarenûsa xwe.

Mirin û neman ji Hovê faşist re Saddam.

Brayê we, Celal Talabanî, Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan April 22, 1987.

Komîta Hevkariya Rêxistinê Kurdistanê yên Siyasî li Swêdê hate damezrandin.

Demek berê, rêxistinêni siyasî yên Kurdistanî beşen Swêdê hatin cem hev û demezrandina komîteke hevkariyê derskirin. Ev hatina cem hev, di meha Nîsanê de, bi demezrandina Komîta Hevkariya Rêxistinê Kurdistanî yan siyasî li Swêdê bi ser ket.

Di van rojan de Komîta Hevkariyê belavokek belav kir. Em Komîta Hevkariyê pîroz dikan û di kar û barê wan de serfirazî dixwazin.

Belavoka Komîta Hevkariyê li jîrê pêşkêşî xwendevanan dikan.

DAXUYANÎ

Ji hemû rêxistin û kesên pêşverû û demokrat re!

Her ku diçe, li Rojhilata Navîn, Qad û çarçova xebat û tekoşîna gelê, Kurdistanê berfirehtir, piralî, tûj û kûrtir dibe. Ji ber vê yekê, doz û pîrsa Kurd û Kurdistanê di rojevîn netewî û navnetewî de cî digre. Bal û awîra raya giştî ya cîhanê dikşîne. Di vê pêngav û pêvajoya (dema) ha de vatinî, berpirsiyarî û pêşengî ji rêxistinêni siyasî re dikevin, pêwîst e, ku ew li ser bingehêkî nişîmanperwerî û demokratî bêñ ba hevdû. Li dij dijmin hêz û dengen xwe bikin yek û hevkariyê bi dostêni xwe re xwirtir bikin. Li Swêdê ji, heta niha di warê siyasî de ev valahî hebû. Em nûnerên rêxistinêni

Kurdistanî yên siyasî, ji bo pêkanîna platformeke netewî û demokratîk ji mîj ve kar û xebat dikan. Ev xebata me ya ha, berhema xwe da. Di roja 11.04.1987-an de em gîhîstîn encameke serfiraz.

Me 13 rêxistinêni Kurdistanî, li ser armanc, prensîp, plana karûbar, vatiñî û perpirsiyariyêni komîta Birêvebir li hev kir; me li ser bingehê nişîmanî û demokratî KOMÎTA HEVKARIYA RÊXISTINÊN KURDISTANÎ YÊN SIYASÎ LI SWÊDÊ pêkanî. Vê komîta ha jî, ji bo bicîanîna karûbarêni pratîk ji 5 kesan KOMÎTA BIRÊ-VEBIR sazkar. Em dê ji ro pê ve, li ser navê vê komîta ha hin karûbarêni xwe yên siyasî bi hevre bidomînin.

Yekîtiya rêxistin û gelê Kurd, jiyanâ dijmin kintir dike!

Rêxistinê sazker ev in:

Partiya Hevgirtina Gelî Kurdi li Sûriyê -Liqê Swêdê, Yekîtiya Nişîmanî Kurdistan -Liqê Swêdê, Partî Karkerî Kurdistan (KIP) -Liqê Swêdê, Partî Sosyalistî Kurd (PASOK) -Liqê Swêdê, Yekîtiya Sosyalista Kurdistan (YSK) -Liqê Swêdê, KUK -Baskê sosyalista Kurdistan -Liqê Swêdê, Partiya Sosyalist a Kurdistana Iraq -Liqê Swêdê, Partî Demokratî Gelî Kurdistan Iraq -Liqê Swêdê, Berey Yekgirtûy Demokratî Kurdistanî Iran -Liqê Swêdê, Ala Rizgarî -Liqê Swêdê, Tevgera Sosyalista Kurdistanê -Liqê Swêdê, Partiya Demokratî Kurdi ya Pêşverû li Sûriyê -Liqê Swêdê, Partiya Sosyalista Kurdistana Tirkîyê -Liqê Swêdê.

11.04.1987

KOMÎTA HEVKARIYA RÊXISTINÊN KURDISTANÎ YÊN SIYASÎ LI SWÊDÊ

Em lîstikêñ dijmin vala derxînin

Z. Agirî

Tevgera gelê Kurdistan roj bi roj ges şiyarbûne nav xelqê zêde, liberx-wedana milet hezтир dibe. Herçend ji aliyê siyasi de valayiyeke xuyanî hebe ji zilm û zordestiya dewletêñ dijmin, şiyarbûneke mezin xistiye nava nete-weyê me. Erîşa dawî ya rejîma faşîst ya Tirkîye li ser Kurdistana Iraqê bû di nav 3 salan de cara 3 yan bû, îspatêkî berçav e ku planêñ dijmin di kîjan merhaleyê de ye. Bi sed hezaran leşkerê tirka li mintaqêñ Kurdistana Bakûr, li derdor sînorêñ Iran, Iraqê û Suriyê de quwetê xwe civandine li ser hev. Rejîma êrîşkar ya Tirkîye, li rojhilata navîn dixwaze rolê xwe ya kevn ya cendermetî bidomîne. Planan çedike ku ji alîkî ve li tekoşîna gelê Kurdistan bixîne, ji aliyê din ve bi zeïfbûna rejîma faşîst ya Iraqê re dixwaze Misul û Kerkukê işgal bike. Yanî, K.Iraqê işgal bike.

Dewletêñ dijmin tenê li welatê me zordestiya xwe nadîn meşandin. Herwîsa li derveyî welêt ji dixwazin gesbûna tekoşîna kurd bidin sekinandin. Van salêñ dawî, piştî 1980 an cîhbûna gelek kesen Kurd li Ewropa, tesira xwe di xebatêñ Kurdan de nişan da. Roj yan hafte tuneye ku şevêñ kurdî, pîrozkirina Newroz, protesto kirina rejîmêñ dijmin ûhw. li bajarêñ cure-cur çenebin. Bi dehan kovar, rojnama û pirtukên kurdî derdi Kevin. Berê vî 8-10 salan li Ewropa ji ber ku Kurd bi hejmar kêmter bûn, xebata wan ï wisa ji ji iro kêmter bû, lê iro êdî xebatêñ ku çedibin, hem ji aliyê gelemeperiyyê de hem ji ji aliyê nave-rokê de hin pêştetir e. Wisa pêştetir e ku, dijmin bi hemû hêzên xwe ve dixwaze vî pêşdeçûnê bişkîne. Lî dij-

min nikare bi awayêñ ku li welat çedike, tekoşîna kurdan bide sekinandin, nikare kurdan bigre bin çavan wan, texîne hepsê zilm û zordestiya xwe ya vekirî bîne cîh.

Ji ber vê yeke ji, ew metodeke din bi kar tînin. Metodêñ dijmin di vî warî de gelek babet in. Em sedî sed nîzanîn ku ew kîjan metodan fro bi kar tînin, lê em tiştekî baş dizanîn ku xebat û listikêñ wan di vî warî de hene. U ya giringtîrîn, ew dikarin bi êsanî di vî warî de hêzê xwe seferber bikin, bi her awayî bixwazin zerarê bigînîn xebata gelê me. Em ji bîr nekîn ku, ew weke dewlet vî karî dîkin. Hêzên wan ji baştîrîn mirovên wan ï pispor pêktê. Bi her awî organîze bûne û hedefa wan kifş e.

Lê, li hember van kirinan em dikarin ci bikin? Ev pirsekî gelek giring e. ku iro di rojevê de ye. Noxtekî dîtir ku pir giring e, ew ji hevkariya di navbera dewletêñ dijmin de di ci merheleyê de ye? Gava em li dîroka Kurdistanê binêrin, em baş dibînîn ku dewletêñ dijmin li hember tekoşîna gelê me du metodêñ esasî bi kar anîne.

1-Hevkariyeke xurt li dij tekoşîna gelê kurd di navbera dewletêñ kolon-yalîst de. Hevkarî di navbera hemû merciyêñ dewletî leşker, polisî dizî û hwd. pêk anîne

2-Dijminatiya di navbera kes, malbat, mintiqe, zarava û rêxistinêñ kurdan. Ev metoda gelek bi kar anîne û xwestine hêzên kurdan bi vî awayî belav bikin û paşê ji bikarîbin wan gor xwestina xwe fidarê bikin. Ev metoda civatekî weke Kurdistanê de ku ji aliyê pêşveçûna civakî bi zanîşî hatiye paşde xistinê, cîh digre. Dijmi-

natiya navbera malbat, kes, mintiqe û hinek rêxistinêñ Kurdan di 100 salêñ dawî de heta iro ji, dem dem bi babeteke nûh derketiye pêş me. Bingeha van bûyeran piranî bi destê dijmin hatiye holê.

Herdu metodêñ jorîn iro ji ji aliyê dewletêñ dijmin tê bi kar anînê. Armanca dijmin ne tenê lêxistina derbeke muaqquet e, yan ji ji bo demeke kurt e, belê armanca dijmin "halkîrina" (Ji ortê rakirina) miletékî ye. Wan bi hemû hêzên xwe ve dixwazin pirsa gelê kurd li gor xwe çarenus bikin. U rastîyeke berçavan e ku dijmin ji bo serketina planêñ xwe dika-re her tişti bike. U dike ji.

Em, gava ji van tiştan agahdar bin, hêzên xwe li dij van metod û planêñ dijmin yek bikin, bi awakî şiyar û zanyarî li dij wan bixebeitin, emê bikarîbin bi kêmter, nîsbî be ji, zerarêñ van planan kêmter bikin. Mercen vî tişti ji alîkî ve têgihîştina naverokêñ xebatêñ dijmin be, ji aliyê din ve ji hazîri û xebatêñ hêzên me li hember van tiştîn qirêj e.

Wekî din, rê tune ye. Divê em endamên neteweyê Kurd bi xwe rewşa xwe baş tê bigihêñ û tedbîrên pêwîst bistînîn. Divê em bixwe bikarîbin ji bo vebûna tekoşîna gelê xwe rîyan bibînîn, xwedî pirsên gelê xwe derkevin. Ji me pê ve kes tune ye ku çendî me dijwarî û zordestiya li ser me bizanibe, xwe ji bo rizgarbûna gel amade bike. Ev bara li ser me hemûyan e; karê me dijwar, dijminê me bi hêz e, lê belê em ji mileték in. Miletek bi sedan sal li hember hemû babe-têñ zilm û zordestiyê xwe bi xurtî parastiye.

Di Nivê Paşîn Yê Sedsala 19-an de Rewşa Kurdan II

*Nivîskar: Celîlê Celîl
Werger: Reşîd Simo*

Şêxan bi navê piştgirî li asîbûnê kirin, pir caran destêن xwe davêtin xelkên olên din jî û zor li wan diki-
rin, ku xûkê bidine wan.

Kesêن dîndar ji vê jî bêtir serên dîndarî û nijadî bi alîkariya sultanan di nava xelkê de li dar dixistin, ta ku hatinêن xwe yên diravî pir bikin. Tevî ku armancêن vê siyasetê di nav Kur-
dêñ nîvbinef de bi cih dihat jî, lê ev yeka di nav qorêñ Ermen, Asorî û Kurdêñ ku di çandinîyê de kar diki-
rin, ne holê bû. (14) Gelek caran niwênerên gelê Ermenî digotin: Doza wan bi giştî ne li dijî gelê Kurd e, lê ew li dijî begêñ Kurdan e, ewêñ ku Kurd û Ermen wek hevdu dicewsînîn. Serokê Ermenî di gazinda xwe de nivîsi: "Ew begêñ Kurdan ne bi tenê cotkarêñ Ermen ji rencberêñ xwe dihejmîrin, lê lawêñ nijadê xwe jî yên ku di bin destê Tirnofiyan de ne, (kesin ji kokek bilind in) wan wek dîlan ji xwe re bi kar tînin." (15)

Bindestiya hevpar ya ku Kurd û Ermenan bi hev re ji destê derebegêñ Kurdan dikêşand wek nûçeyekê ji Sataxê hat (16). Li Sataxê erd di bin destê derebegêñ Kurdan de bûn. Ne li Sataxê bi tenê, lê li hemî herê-
mîn din yên Tirkiyê. Li hemî deve-
ran milkdarêñ erdê yên mezin ji Kur-
dan bûn. Herwisa erdêñ çandinê yên pir li aliyêñ Senceqê, milkê du dere-
begêñ Kurdan e: Emîr Axa û Huseyn axa, van herdu kesan hemî xelkê wê herêmê ji xwe re bi kar tînan (17).

Beg û şêxên Kurdan serdestî li hemî herêmê Bakura Rohilata Empereto-
riya Osmanî dikirin. Cotkarêñ Erme-
nan yên ku li herêmê Bakur rûdiniş-
tin, di bin nîrin gelekî hişk de dijiyan
û tu alîkarî ji aliyê hukmetê de wer-
nedigirtin. Li ser wan diviya bû, hemî daxwazêñ derebegêñ Kurdan bi cih
bikin.

Di nîvê paşîn yê sedsala 19-an, erdêñ derebegêñ Kurdan firehtir û pirtir bûn. Erdêñ çandinê li ser hesa-
bê firehkirina milk di riya wîrasetê re

pirtir bûbûn. Erd ji hukumetê diha-
tine kirin, bi darê zorê erd ji cotka-
rêñ biçük dihate standin û zulm û zor
li gelên ne misulman dihate kirin û ew
diqewtandin.

Cotkarêñ ku ji erdê bêpar bûn, ew
ji aliyê qanûnî de bi serê xwe bûn, lê
ji aliyê aborî ve, ew bi temamî bi dere-
began ve girêdayî bûn. Derebeg bi
nîvî erd didane cotkaran, lê reng û
tonêñ wê nîvîbûnê pir bûn, ew li
Rohilata Tirkiyê gelekkî belav bûbûn.

Li ser rîzana nîvîbûnê ya ku ji "çaryekbûne" nêzik
e, V. I. Lénîn nivîsi: -Di bin siya
wê rîzana de, askere rîzana karê bi
kirî bi tevayî xuya dibe û bi taybetî
koletî û hovîtiya bi zorê kar kirin-af-
. (18)

Derebeg her tiş di bin nîrê çewsanda-
nia hişk de dida cotkaran: Pêwen-
gêñ berhemiyê, erd û tov. Bi sehadeta Ardo: Dema parvekîrina mehsûlê
derebeg 2/3 an ji xwe re dibir. (19)
Derebeg bêtir cotkar diçewsandin û
dixwest heyânî dewar û aletên çandî-
nê jî ji wan bistîne.

Digel xizanîkirina cotkaran, dere-
began doza başiya xwe dikrin, wan
çelek didane cotkarekî ku bi tenê sîrê
wê bixwe, hinek genim û ceh jî dida-
ne cotkaran, ew jî bi deyn bû. Lê deyn-
ê derebeg, ev mirovê "baş" cotkar
bi temamî ji aliyê aborî ve bi xwe ve
girêdida. Ji bilî para derebeg, cotkar
ji mehsûlê xûka hukumetê jî dida.
Ger malbata derebeg li gund ba, divi-
yabû, kulfeta cotkar an carîkdar xiz-
meta wan jî bikin. Ji ber ku derebeg
li kirîkaran wek hêzek karker dinêrî,
mafê wî hebû ku li wan xîne û ta wan
ji gund bikeder jî.

Suxre û kar ji bona derebeg, ji xiz-
meten mift bûn, diviyabû hemî cot-
kar pê rabin. Gelek nimûne hene ku
em dikarin bêjin, ku cotkar bi tamâ-
mî bi derebeg ve girêdayî bû. (20)

Li sala 1893 an cotkarêñ
gundê Xûsanê ji derebeg Muhemed
Axa re kar dikirin: "Di du rojan de

30 kesî arvanê wî rakirin, 500 kesî
mehsûla wî dane hev, 50 kesî rîyêñ
wî di sê rojan de çekirin, 450 kesî
genimê wî kirin enbaran, 150 kesî jê
re xaniyek ava kirin, xelkêñ gund jê
re hirî û tişîn avakirinê pêşkêş kirin.
(21)

Bê dilovanî cotkar dihatine çew-
sandin, derebegêñ Kurdan demêñ
xwe li tekliñen mezin û li nêçîrê dibor-
randin. A. A. Arakaliyan, ew bi rastî,
bi wan çilekêñ ku bi tenê dikarin
çekan baş bi kar hûnîn navandi-
bûn. (22) Ilzî Rîko, xizaniya ku
Ermen û Kurd tê de dijiyan, dabû ber
dewlemendî û kêfxweşıya jîna dere-
began û nivîsi bû:

Xaniyêñ zivistanê li nik Kurd û
Ermenan wek hev in, piraniya wan
xanikêñ biçük in, ta bi nîvî di bin erdê
de ne, serbanêñ wan bi dijwarî jî erdê
teniştê cuda dibe. Giyayê ku li serba-
nan şîn dibe, li erdê teniştê jî şîn dibe,
ew gul bi xwe bihar havînan li vir û
dipişuvîn. Ger çavê mirov li sergû-
yêñ bilind nekeve, ewêñ ku li teniştâ
malan e, ewê bibore bê ku malan
bibîne. Her wisa hin şêxên dîn yên
Kurdan xwediyê malin mezin in ji
keviran avakirî ne, an ta ji mermer
in... (23)

Rewşa cotkaran bi guhartina
pewendiyêñ kirin û firotina bi peran
bêtir pîs bû. Gelek ji derebegêñ ku bi
bazarê ve girêdayî bûn, ji cotkaran
xwestin ku baca xwe bi peran bidin,
ne yek bi yekê (eynî). Dijwariyêñ ku
cotkaran diditîn ta ku mehsûla xwe
rakin bazarê, ew mecbûrî alîxwesti-
na bazirganêñ pispor dikirin, pirani-
ya wan bazirganan monopolîst bûn,
di destêñ wan de gelek mal hebû.

Bac û xûkêñ giran û xizaniya cot-
karan nema dihêşt ku cotkar xûkê
bidin û tovê sala werê hilînîn, ji ber
vê yekê jî ew mecbûr bûn, ku bi sim-
saran re dan û standinê bikin, ew bi
wan ve girêdayî bûn. Herwisa bac bi
berdewamî bilind dibû. Deh ji yekê
baca serekîn bû. Ew ji mehsûla çan-

dinê dihate birin, "nisbeta wê ya resmî %10 ji tene bû, pûş û pelasê hişkirî, hişnâhî (sebze) û meywe jî wek wê nisbetê bû" (24). Wek rêzan, 1/10 an di praktikê de bi kar nedihat, bêtirî %10 ji mehsûlê dihate birin. Di sala 1867 an de %15 hate birin (25), di salên 1868-1870—8c- de %12,5 hate birin.

Yek ji dehan di riya karbidestê hukûmetê re nedihate standin, lê belê ew di riya mutehîdan re dihate standin. Wek nimûne îdarabenkê Osmani ji mezintirîn mutehîdan bû, ew yek ji deh bû li Tirkîye. (27)

Pir caran derebeg bi karê mutehîden biçûk radibûn. Herêmek didane wan, ew herêma ha pir caran ji 4-5 derecan bû. (28) Komkirina bacê bi vî awayî, giringiyake mezin dida ser milên cotkaran. Karlayl Mak Kwan nivîsi: Nerindiya vê bacê ne di babet û tibaba wê de ye, bi qasî ku di komkirina riya wê de ye (29). Tibaba baca ku ji xelkê dihate standin, gelekî ji pereyênu ku dabûn mutehîd pirtir bûn. Cotkaran mesrefa tehsîldarêن "deh-yekê" û ya yawerên wan jî didan. Wan her wisa dîsbîrsî jî distandin, ango westa asorcî. Ji berdêla xwarinê ve bû. Holê cotkaran bi henekî li gel tehsîldarêن bacê digotin!

Baca milk ji bacêng giran bû, ew ji navçeyekê ta bi navçeyeke din ji welêt dihate guhartin (baca milk, xanî, hatin nifûsan "neferan"). Qunsulê Rûsî di nameyek xwe de nivîsi: "Kurd û Ermenê ku bacê didin, bê ku ew zanibin, ev ji bona çî ye û tibaba wê çiqase, piraniya mezin ji xelkê yekcar di vê yekê nagihin". (30) Tehsîldar ev keys didîtin, cotkar talan dikirin. Kêmbûna hejmara xelkê li gundan û rewşa milkêng wan di dema komkirina bacê de berçav nedigiritin. Ji ber vê yekê ji cotkaran bi kulfetên xwe ve ji gundan bar dikirin bajarêng din ta ku bacê li ser kesekî winda an mirî ji gundê xwe nedin.

Qamûr (31)-ae-baca mih, bixin û gamêş û h.w.d-af- ji bacêng giran bû li ser milên xudanpezan. Ev baca ha ji mirovên ku li nik wan: mih, bixin, beraz û dewarêng bi qiloç hebûn, dihate standin. Herwisa berhevkirina vê bacê ji spartin mutehîd. Di pêşiyê de ew cînî dihate standin (ji her deh serî pez yek dibirin) (32).

Lê paşê perêng hişk distandin (sê qurş li ser her pezekê). (33) Bi vê yekê rewşa xudi pezan ducarî pîs bû. Qun-

sulê Rûslî li Erzeromê li ser dijwariya berhevkirina diravan ya ku qamcûrcî pê radibû nivîsi: Pir caran hem welatiyê xizan ji qamcûrcî re digot: Berxekî bibe! Li cem min pere nînin, lê qamcûrcî bersiva wî dida: berx û karê bi çermê xwe ve ne hêjâyî sê qurşan e. Ka peran perêng ku li nik te hene. (33)

Li gor hin statîstîkan hatina qamcûrcî li wilayeta Erzeromê di destpêka heftiyan de gîhîşt 210 milyon qurû. Gelek ji Kurdên binecî yên ku pez bi xwedî dikirin, dest ji gundêng xwe berdan û li koçeriyê vegeriyan bi tenê ta ku ji qamcûrcî felat bibin.

Li gundê Kurdan "Norsînê" yê ku li deşta Mûşê dikeve 400 malbat hebûn, lê jê bi tenê 50 mal mabûn, bi ser de jî ev ên ku mane bi ber talana Kurdên koçer diketin. Wek Motkiyan û Xotiskiyan. Qunsulê Rûsî li Erzeromê nivîsi: "Kurdên Norsînê ji min re gotin: Ku jiyan li Motikê baştır e, li wira ne qameçûr heye û ne jî ew diçine leşkeriyê, tevî ku li Motikê qeymeqam heye, lê ew ji tırsan re xuya nabe. Ew li bajarê Xelatê dimîne û li wir jî rûdine. (34).

Ji bili bacêng ku me gotin, ji cotkarê Kurd resimên têvel jî dihatine standin, bi hemî awî pere ji wan dihatin berhevkirina, hejmara wan gîhîştibû çili. Wek: Baca xoyê, nêçîra masiyan, resimên li ser êzingêng ku dibirin bajêr, hêstina ku caw li bajêr bi renge hişin boyax bikin û resimên dadmendiyê û baca ku li ser malê nerakîrî (dapo) û ji bili wan û wan.

Ji zortirîn resiman resima pacê (gumrîk) bû, ya ku li ser tiştên xwarinê yên ku ji derve dihanîn, ev resima ha heyânî di rojêng bihabûnê de jî berdewam bû. Vê yeka ha li pêş rakirina tene dibû dîwar ku ew bi navçeyen birçî gihîne an ji bili tiştên xwarinê yên din. Paciyê (gumrîkê) nedîhêst ku pêwendiyêng aborî di nav bera nûçeyen Tirkî de xurt bibin, tesîreke mezin li bazirganiya deverîn kir. Ev resim di sala 1874 an de hate rakirin.

Wek me berê jî gotibû, ne bi tenê meblexê peran ziyanî digihande cotkaran, lê riya berhevkirina wan xûk bêşan bêtir giran bûn. Ew ne di demeke xuyade ji sal dihatine berhevkirina, ew li gor xwestina karbidest an Deriyê Bilind bûn. Dema ku mal di dema xwe de ne gihiştiba dîwanê, gef û gurli karbidest û qeymeqaman dihatin xwarin, ku wan ji kar bavêjin. Ev gef

û gurêng han dihêstin ku karbidestê hukûmetê pir caran wê bacê bi xwe di salekê de gelek caran kom bikin. Ew ji cihêng xwe yên hejhejok ditirsiyan, di sala yekê de xwe bi talankirina xelkê dewlemed dikirin. Bertîl ji didane karbidestê bintir. Holê wan cihê ji bona demeke demdar diparastin. Li herêng Miyandobê ya ku li İranê dikeve, di nava du salan de pênc qeymeqam hatin guhartin. Lê her yekî ji wan bi dirêjiya mayîna xwe dikarîn li hemî navçeyan bigerin û di riya xwe re mal û diyariyan bi zorê bistînin. (35)

Holê cotkarê Kurd ji pêş hukûmetê, derebegêng beg û axa hatiye çew-sandin. Ev hemê tiştên ha hêştiye ku Kurd ji bona mafêng xwe bi xebatê rabin.

Xebata rizgarî ya gelê Kurd li dijî karbidestê Tirk tim ji berhev hilwesiye, ji ber ku êlên Kurdi yên derebegî ne li hev bûne. Herwisa mîriyên Tirkîye piştgîrî ji hevalbendêng xwe yên Ewrupayî wergirtine, ewen ku siyaseteke koliniyâfî dabûn pêşa xwe?

(14) -Ustêng civakî yên vê bindestiye, ji ber xebatê ji bo cêrîgehan û standina hin herêmên nuh bû.

(15) -Dîwana dîroka Ermenî, beşê, (cûz) 13, r 465.

(16) -Li ser vê meselê li kitêba I. K. Sarkîsyen binêr, di wê de rastîne baş hene, navê wê: Siyaseta Çandiniyê ya Hukûmeta Osmanî li Roava Ermîniyât, Erivan 1957.

(17) -M. A. M. Kalobkîn, metirîyalin ji bo erdpîvanek statîstîki leşkerî ya Asiyaya Tirkî, cild 3, beşê 1, fesil 2, Teflis, 1891, r 60.

(18) -Lênenîn, Pêşketina Sermiyan-dariyê li Rûsiya, Nivîsarêng tevayî, cildê 3an r 192.

(19) -Wilayetên: Erivanê, Betlîsê û Erzeromê, çapa Erivanê 1912, r 276.

(20) -Li Z. Girîn binêr, astengiya Ermenî û desaleta Tirkan, komikek berhevkirî, rewşa Ermenan li Tirkîye ta têkiliya dewletêng gewre sala 1896, r 259.

(21) -A. D. Novîtsîv, lêkolînîn li ser aboriya Tirkîye ji berî cenga cihanê, Mosko-Lîningrad 1937 r 61.

(22) -A. A. Arakîskîyan. Kurd li welatê Faris, nûçeyen beşê akadîmîya jugrafi-Qefqas -li nik emperetoriya Rûsî Teflis 1904 r 13.

(23) -I. Rîklo, mirov û erd r 305.

CEJNA NEWROZ BI GELHEMPERÎ

Cejna Newroz îsal li gelek bajarên Swêdê bi awakî gelhemperî hat pîroz kirin. Piranî komelên endamên Federasyonê li bajarên xwe Newrozê pîroz kirin. Li Stockholm, Uppsala, Sundsvall, Bollns, Eskilstuna, Karlskoga, Söderhamn, Göteborg, Lund, Jönköping û li gelek bajarên din jî Newroz hat pîroz kirin. Pîrozkirina cejna Newrozê nêzîkî mehekî ajot.

STOKHOLM

Li bajarê Stockholmê, ku zêdetir Kurd lê dijîn, roja 22 ê Adarê bi besdarbûna nêzîkî 1000 kesan ve roja Newrozê destpêkir.

Di programê de muzîk, stran û govendên Kurdî jî bo mîvanan hat pêşkeşkirin. Li ser navê Federasyonê bi kurdî û Swêdî du axaftin çêbûn.

Stranvananê bi navûdeng Ciwan Haco, Delal û Rênas bi stranên xwe ya gelêri ve programê geş kirin. Gurubê folklorêne kurdî Koma Govend û Koma Komela jinan, bi lîstikên Diyarbekir û Wanê roja Newrozê xemilandin. Guruba muzîk ya Alan Botan bi stranên kurdî besdariya sevê bûn.

Îsal cara pêşin bû ku li Stockholmê Newrozek tenê çêdibû.



Foto: Şoreş Zirek

NEWROZ PÎROZ BE!

Gelê me îsal jî cejna Newrozê di bin zilm û zordestiyê de pîroz kir. Zordestiyê dijmin roj bi roj zêdetir û xurtir dibe. Li her derê Kurdistanê berxwedana gelê Kurdistanê di bin şertên dijwar de dom dike. Dewletên kolonyalist bi hemû hêzên xwe ve êrîş dibin ser tekoşîna gelê me; dixwazin serketina têkoşîna azadiyê rawestînin, bi kuştin, girtin û talankariya xwe ve gelê me bitirsînin.

Lê dîroka gelê me nîşan daye ku dijmin nikare bi girtin, kuştin û bombebarandinê ve têkoşîna azadiya gelê

kurd rawestîne, cawa li cîhanê têkoşîna xelkekî bindest nehatiye rawestandin.

Cejna Newrozê îro bûye nîşana azadî û serxebûnê. Lewra pîrozkirina Newrozê tirsa dilê Dehaqên nuh weki Kenan Ewren, Saddam Huseyn û Xumeynî zêde dike. Lewra li welatê me pîrozkirina Cejna Newrozê hatiye qedexe kirin. Biryarên dewlettên dijminan, êrîş û tedbîrên wan têr nake ku pîrozkirina Newrozê li Kurdistanê were rawestin. Herweha xelkê me îsal jî li Kurdistanê ci dizî ci

eskere Cejna Newrozê pîroz kir, agirênen serî hildanê pêda.

Cejna Newrozê ne tenê li welêt, herwisa li dervayê welêt jî, li Ewropayê, Emerîkayê, Awîstralayê, di cî û warênu kurd tê de dijîn, tê pîroz kirin. Bi dehezararan welatperwerên kurd bi pîrozkirina Cejna Newrozê ve têkoşîna gelê me li Kurdistanê bi hêz dikin. Herweha diyar dîkin ku neteweyê kurd li dij kirinêni dijmin dikare dengê xwe bilind bike.

CEJNA NEWROZÊ PÎROZ BE!

HAT PÎROZ KIRIN

SÖDERHAMN:

Komela Kurd li Söderhamnê di 28 ê meha Adarê de bi hevkariya ABF ê Cejna Newrozê pîroz kir. Di programê de raxistineke sûretan, film di derheqa Kurdistanê de û muzîk, stran û govendên kurdî hebû.

ESKILSTUNA:

Komela Kurd li Eskilstuna şeva Newrozê di 21 ê Adarê de pîroz kir.

Kurdên ku li derdora bajara Eskilstuna yê dijîn, di şevê de besdar bûşn û nêzîkî 300 kesen Kurd û Swêdî hatibûn şevê.

Di programê de muzîk, stran û govendên kurdî hat pêşkêşkirin. Xwarinê kurdî ji bo mêvanan hazir kiribûn.

SUNDSVALL:

Komela Kurd li Sundsvallê roja 28 ê adarê cejna Newrozê pîroz kirin. Di şevê de xwarina kurdî, axaftin, muzîk, stran û govendên kurdî ji bo

mêvanan hat pêşkêş kirin.

Nêzîkî 500 kesen Kurd û Swêdî di şevê de besdar bûn.

UPPSALA:

Li bajarê Uppsalayê jî pîrozkirina Newrozê di roja 22 ê Adarê de çêbû. Program êvarê seet 18.00 destpêkir.

Di programa Uppsalayê de jî wek yê Stockholmê Ciwan Haco, Delal, Koma Govend, Koma Alan Botan, bi muzîk, stran û govendên kurdî şeva Newrozê ges kirin.

Newroza Uppsalayê ji aliyê Komela Kurd li Uppsala hazır bûbû û di şevê de nêzîkî 600 kes besdar bûbûn.



Axaftina şeva Newrozê

Xwûşk û birayên hêja!

Hûn ser seran ser çavan hatine şeva Newrozê, Newroza we pîroz be. Em hêvî dîkin ku Newrozê hêtê emê li Kurdistanê azad bi hev re pîroz bikin.

Belê xwûşk û brano, hêviya me hêviyeke gelekî mezin e û rê li pêşîya hêviya me ya pîroz gelekî dijwar e. Ji bo Kurdistanê azad xebateke bêwestan û dest di dest de divê.

Edet e, wekî di civinê weha de, em welêt bi bîr tînin û li ser rewşa welêt disekinin. Bêguman divê Kurdistan her tim di bîra me de be, em her tim rewşa welêt bînin ber çavêن xwe.

Îro li Kurdistanê rewş nehatiye guhartin. Êrîşen dijmin her xurt dibe. Bombebaran zulm, zîndan û êşkence her berdewam e. Ev yeka ji aliye me hemûyan ve tê zanîn. Ji xwe ew êrîşa dijmin e, ku bûye sedema dûrketina me ji Kurdistana şîrîn.

Baweriya me ev e, ku divê bêtir em li ser pirsekî bisekinin û ji bo wê ji xebatê bikin. Gelo emê bi ci awayî

piştgiriya tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê bikin? Bêşik, qeweta herî mezin di yekîtiyê de ye. Ji bo ku em karibin piştgiriyeke xurt bidin tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê, divê em yekîtiyekê di nav welatparêzên kurd de sazbikin.

Lazime em diyar bikin wekî yekîtiyekê çawa? Bêgoman yekîtiyekê siyasi, eniyeke netewî û fireh daxwaza hemû kurdên welatparêz e. Ev kara, ya rêxistinê me yên siyasi ye. Divê em hertim ji wan daxwaza yekîtiyekê bikin.

Lê yekîtiya ku em dikarin û îro ji pêwîst e, yekîtiya di nav kurdên li dervayê Kurdistanê ye. Em dizanin ku tenê li Ewropayê nêzî nîv mîlyon kurd dijîn. Lê pir mixabin, resistineke giştî ku van nîv mîlyon mirovan, xwedî derkeve û bi pîrsên wan mijûl bibe, tuneye. Bawerim her heval dikare taxmîn bike ku, gava em ji %10-ê wan nîv mîlyon mirovan ji bi rêxistinî bikin, wê qewata me ciqas mezin be!

Lewra gelî hevala, divê li van welâtên Ewropayê em di rêxistinê demokratîk de cîhê xwe bigrin û bi hevre dest di dest de bixebeitin.

Divê em xebatên pêwîst ji bo zarok, ciwan, jin û multeciyê kurd bikin. Her weha divê em ziman, edebiyat û çanda xwe pêşde bibin. Li welêt em dibêjin dijmin qedexe kiriye, raste jî. Lê li Ewropayê em azad in, ne tenê em azad in, her weha em dikarin alîkariyê jî ji civata Ewropa-yê bigrin.

Îro Federasyona Komelê Kurdistanê li ser vê bingehê xebat dike. Divê em ji bo xurtkirina Federasyonê bixebeitin û herweha kar bikin ku Federasyonê weha di welatên Ewropa yê din de jî saz bibe, ku em karibin hemû kurdên welatparêz li Ewropayê di bin baskên rêxistineke demokratîk, civakî û her weha netewî de bicingin.

Wê çaxê gelî hevala, emê karibin piştgiriyeke mezin bidin tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê. Elbet ev piştgiriya me wê li gor xwe rojên heviya Kurdistanê azad, nêzikir bike.

Xwûşk û birayên hêja, dawiya axaftina xwe de, careke din cejna we ya Newrozê ji dil û can pîroz dikim. -Pîroz be cejna netewî Newroz!


-Bijî Kurdistanê azad!
-Bijî yekîtiya hêzên Kurdistanî!
-Slav li pêşmergeyê qehreman!

Şeva Newrozê li Bollnäsê

Komela Kurd li Bollnäs 29 ê Adarê bi beşdarbûna nêzîkî 250 kesên Kurd û Swêdî Newrozê pîroz kirin. Şeva Newrozê programeki dewle-

mend pêşkêşî mîvanan kir. Stran, muzîk û govendên kurdî şevê xemiland. Koma govend û Koma Zarokan bi listikên kurdî şevê geş kirin.

Rojnameyêñ Swêdî yên bajarê Bollnäsê bi firehî behsa şeva Newrozê kirin.



KARLSKOZA:

Kurdên bajara Karlskoga di roja 21 ê Adarê bi beşdarbûna nêzîkî 600 kesên Kurd, Swêdî û biyaniyêñ din, cejna Newrozê pîroz kirin.

Programeke gelek dewlemend pêşkêşî mîvanan bû. Xwarinêñ kurdî, axaftina serokê kulturnmdenê wî heremê, muzîk, stran û govendên kurdî şevê xemiland. Koma Govend bi listikên Diyarbekrê û def û zirnê şevê geş kir. Gelek kom û gurubêñ muzîk û folklor ya biyaniyan jî di şevê de beşdar bûn. Rojnameyêñ Swêdî yên bajarê Karlskoga bi firehî behsa şeva Newrozê kirin.



RÊXISTINÊN JINAN PIŞTGIRIYA PIRSA KURDÎ DIKIN

Komela Jinên Demokratên Kurdistanê li Swêdê, di 8ê Adarê de bi 25 rêxistinê din ya jinan ve namek şandin ji Koma Netewan re û xwestin ku pirsa kurdî têkeve rojeva Koma Netewan.

Di roja 29ê Adarê de jî, kongra Jinên Sosyaldemokratên Swêdê hukumatên Tirkîyê û Iraqê ji ber êrîşa li ser gelê kurd protesto kirin û ji serokên van dewletan re nameyên protestoyê şandin.

Nameyên ku hatin bahskirin, em li jêrê bi wergera kurdî pêşkêşî xwendevanên xwe dikan.

Sekreterê giştî Perez du Cuellar
Koma Netewan
New York/USA

Ji komîta 8 ê Adarê
Stockholm/Swêd

Komîta 8 ê Adarê, ku ji 26 rêxistinê jinan pêk tê, roja 8 ê Adarê, bîr-yara daxuyaniya jîrîn girtiye.

Li gor informasyonên ku gihiştiye me, jinêne Kurdistanê di bin cotzordesîke dijwar de ne. Li Tirkîyê, jinêne Kurd ne dikare bi zimanê xwe biaxîfe ne jî dikare bêje ew kurd in. Cezayê van tiştan heps e. Iro gelek jinêne Kurd li girtîgehîn tirkan de ne. Wek numûne: 6 jinêne kurd ku roja navnetewî ya jinan, 8 ê adarê pîroz kirin, 48 sal ceza girtin.

Lê herwisa li Iran, Irak û Suriyê ji jin û zarokönen kurd di bin teda û zordestiyê de ne. Hêviya me ji ber vê yekê ew e, ku KN (Koma Netewan) pirsa Kurdish bigre dest û hewl bide ku teda û zordestiya li ser jin û zarokönen Kurdish bê sekinandin.

Komîta 8 ê Adarê
Stockholm 8.3.1987

Nameyên kongra Jinên Sosyaldemokratên Swêdê ji hukumatên Tirkîyê û Iraqê re Stockholm 29 Adar 1987

Ji hukumata Tirkîyê re

Bi rîya weşanên giştî em di derheqa rewşa Tirkîyê de xeberan digrin. Di van xeberande li ser rewşa Kurdish jî em agahdar in. Gelek eşkere ye ku mafê mirovatî ya vî gurûbî ji aliye meqamên tirkan ve naye qebûlkirin. Wek nûmûne, peyivandin yan nivîsandina kurdî qedexe ye, wek perwerdekirin bi zimanê kurdî di dibistanan de. Zarokên Kurdish, mecbûr dimînin ku li dibistanan marşen şovenî ya tirkan ezber bikin, wek, "Şerefeki gelek mezin e ku em tirk in". Wek jinêne Swêd, em gelek pê ne nexweş in ku ji bo şes endamên Komela Jinên Demokratên Kurdistan, 48 sal cezayê hepsê hat xwestin, ji ber ku wan roja navnetewî ya jinan pîroz kirin û bi zimanê xwe axaftin. Bi êşkence, kuştin daliqandin û hepskirina jin û mîrîn Kurdish, rejîma Tirkîye li hember mafê mirovatiye xwe bi awakî gelek cidî gunekar kiriye, û em daxwaz dikan ku teda û zordestiya li ser Kurdish bisekine û girtiyên siyasi bê serbest berdanê.

Herwisa em gelek nerehet in ku balafirêne tirk car car ser gundên Kurdistanâ Iraqê bombebaran dikan. Cara dawî roja 4ê Adarê, 30 balafirêne êrîşê ya leşkerî êrîş bir ser neh gundên Kurd. Erişike qirêj li hember mirovîn sivil ya bê mudafa.

Em wekî din ji hukumeta Tirkîyê daxwaz dikan ku surguna mecbûrî ya 2,5 milyon Kurdish bo Rojavayê Tirkîyê bide sekinandin. Kirinekî wisa bi eşkere li dij prensibîn mafêni mirovatiye ye.

Ji hukumetê Iraqê re,

Li welatê me, gelek jin û mîrîn Kurdish hene ku ji ber tedayêni siyasi ji Iraqê reviyane hatine Swêdê. Hem ji wan hem jî ji weşanên giştî ya Swêdê em li ser rewşa kurda informasyon distînin. Em hatin têgihîstineke wisa ku, mafê mirovatiya vî xelqê bi tu awayî ji aliye rejîma Iraqê ve naye qebûlkirin. Wek nûmûne, ji bo zarokönen Kurdish bi zimanê xwe nikarin xwendinê bikin û gundên wan hertim di bin êrîşen leşkeriyê de ye, ne bes ji aliye rejîma Iraqê, lê herwisa ji aliye rejîma Tirkîyê jî. Ev yeka vekirî eşkere dike ku di navbera Tirkîye û Iraqê de peymaneke müşterek li dij berxwedana Kurdish heye.

Em gelek aciz in ku hukumeta we li ser Kurdish teda û zordestiyeye dijwar dike û kesen ku li hember van zordestiyan radibin bi heps, êşkence û kuştinê tên cezakirin. Em daxwaz dikan ku hemû girtiyên siyasi bila bê serbest berdanê û êrîşen li ser gundên wan bê sekinandin.

Yekîtiya mamosteyên kurd

Di 4 ê Nîsana 1987-an de di, li Stockholmê, yekîtiya Mamostayên Kurd, kongrê xwe yê damezarandinê girêda. Di vî kongrê de nîzîkî 30 mamostayên kurd ji her çar perçen Kurdistanê amade bûn. Bi awayekî demokratîk, pirs û pirsgirêkên dersdan û xwendina zimanê kurdî li Swêdê hat behskirin. Herweha projeyê destûra yekîtiyê yê ku ji aliyê komîta amadekar hatîye berhev kirin, bi hin

guherînên sivik hate pejirandin. Paşî ev mamostayên jêrî hatin helbijartîn ji bo komîta karger! Lutfî Baksî, Emîr Qazî, Muêyed Teyib, Aso Germiyanî, Mustefa Cegir: Hessen Qazî, Ahmed Mekî Piştî komîta karger hatiye helbijartîn, kongre bi dawî hat. Kongirê nîzîkî 5 seetan domand.

Semînerek li ser Kurdistanê

Di roja 29-ê Nîsanê de, li ser vexwandinâ dibistana bajarê Västeråsê, du hevalên berpirsyarê Federasyonê le ser Kurdistanê ji bo şagirtên sinifa 7-an semînerek dan. Şeş sinifên 7-an berê de li ser Kurdistanê xebitîbûn, her grûbekî şagirt babetek li ser Kurdistanê wek wazîfe girtibû. Roja 29-ê Nisanê, divabû her grûbek zanistîyên xwe li ser Kurdistanê pêşkêşî hevalên xwe bikira.

Nunerên Federasyonê, li sinifan gerîyan û guhdariya grûban kirin û bersîva pirsên wan dan. Şagirtên kurd

ku di wê dibistanê de dixwendin, hevalên xwe yên swêdî vexwandin ser xwarina kurdî.

Di dawiya rojê de, hemû şagirtên sinifên 7-an (96 şagirt) di salona mezin de civiyan û guhdariya berpirsyarê Federasyonê kirin. Li gel axaf-tina li ser Kurdistanê, dîaresimên ji Kurdistanê jî hate nîşandan. Hemû şagirt û mamosteyên wan ji xebata li ser Kurdistanê geleki razî man û geleki jî heyirî man ku zarokên kurd nikarin li welatê xwe bi zimanê xwe bixwînin.

Dûmahika rûpel 11

(24) -I. D. Malam, Derpêşkirinek ji wîlayeta Erzeromêre, 1874 r 28.

(25) -K. Mak Kwan, Koloniya me ya nuh r. 289.

(26) -Erşîva siyasi ya derveyî Rûs-ya, "Erşîva serekîn" F. E. 1872, belge 1803 r 7.

(27) -Rastofiskî. Bac li Tirkîyê (nameyên qunsul li Bîtolî) "Komikek nameyên qunsulî" çapa çaremîn 1899 r 534.

(28) -Mak-Kwan, Koloniya me ya nuh . . . r 290.

(29) -Serekaniya berê.

(30) -Erşîva siyasi ya derveyî Rûs-yayê, F. A. "Erşîvî serekî" F. A. belge 1083 r 12.

(31) -Karlayl Mak Kwan, ev bac bi (sayme) navand, li "Koloniya me ya nuh binêre" r 294, û Malama ev baca li ser mih û bizinan bi "mihan" navand, li "Derpêşkirinek ji wîlayeta Erzeromê re" binêre r 31".

(32) -K. Mak Kwan, Koloniya me ya nuh . . . r 294.

(33) -Erşîva siyasi ya derveyî rûsi-ya "Erşîva serekîn" F. A. 1872 belge 1083 r 13.

(34) -Serekaniya berê r 14-15.

(35) "Correspondence respecting the populations in Asia Minor and Syria. Turkey, N 10 (1879)", London, 1879 P. 57.

NIHA SWÊD INSULINÊ DIGUHERÎNE!

Meha 1 ê Nîsanê destpêka derbas-bûna insulinaa 100 e. Heta 1 ê Cot-mehê hemû kesên ku bi wan re nexweşiyê şekirê heye, divê derbasî vî insulina nûh bibin. Ji xwe wê vî şûnde di dermanxane de bes ev dermana bê firotin. Tu jî divê yê xwe biguherîni. Insulin 100, ji Insulinê kevn tîrtir e. Ji bo vê yekê divê tu derziyên nûh ji bo xwe peyda bikî ku pîvana dermanê rast bibe.

EW KESÊN KU PÊ RE NEXWE-
ŞİYÊ ŞEKIRÊ HEYE, DIVÊ BI LEZ
KONTAK BI DOKTORÊ XWE RE
ÊKE KU BIKARIBE REETA INSU-
LIN 100 Ï Ü DERZİYÊN KU LI
WAN TÊN PEYDA BIKÎ

Tu dikarî agahdariyên zêde ji nexwes-xanan yan jî ji muayenexanayê nexweşen şekirê bistînî. Ger zehmetiya te û zimanê Swêdî hebe, tu dikarî ter-cuman bixwazî.



STOCKHOLMS LÄNS LANDSTING

DI GIRTÎGEHA DIYARBEKRÊ DE

KELEŞ

Li ser girtîgeha Diyarbekirê heta iro gelek hatiye axaftin û hinek tişt jî hatine nivîsandin. Mirov tucarî nikare ew tiştên ku dihatin serê girtiyêngirtîgeha Diyarbekirê, hemûya bi awakî tevayî bîne zimêñ. Kesêñ ku ew jiyan nejîne nikarin ew tiştên têngotin hemûya bawer bikin. Lî mixabîn gelek bûyerên dûrî aqilan di serê me de derbas dibû. Ez bi xwe nêzîkî sê salan di wê girtîgeha bi navûdeng de ma me. Baweriya min ew e ku li gora mercen iro rewşa girtîgeha Diyarbekir ji kampêñ Naziyan gelektortir bû.

Daxwaza min ev e ku ew zordariya ku dihate û têñ serê mirovên şoreşger û welatparêz bi kurtayî ji xwendevanêñ Berbangê re pêşkêş bikim. Kêmasî wê gelek hebin, bes ew tiştên min bi xwe dîtine û di serê min de derbas bûye, ezê ji were re pêşkêş bikim.



Ev girtîgeha bi navûdeng di 24ê sibata sala 1981-an de dest bi karê xwe yê zulm û zordariyê kir. Ew dest-pêk bi hatina mufreza komando û serokê wan Esat Yildirim (Min navê Esat Yildirim pişti ji girtîgehê derketim hîn bûm.) berdewam kir. Rojêñ me bê lêdanêñ bi jopan derbas nedibû. Teda û êskencê bûbû perçak ji jiyana me. Di girtîgehê da qelem û defter, bi hevre axaftin, ken û henek, şusîn tunebû; bes marş û ezberkirin, lêxistin û dengê meşa komando hebû.



Heta ez derketim min bi xwe 40 mars û du axaftinêñ Ataturk yên dirêj û pirtükek 101 rupeli ezber kiribû.

Li Tirkiyê û li Kurdistanê bi giranî êskencê û tedayê ku dihat serê insanî polîtik û welatparêz ev bûn.

Feleqe, dana elektirîkê, dardekirin, bi xorêmê ava cemidî li gurçika kirin, kişandin, bi kîsê qûmê lêxistin, bê xew hîştin, birçi û tî sekinandin, xistina tabûtê, serberjêr dalîqandin, xwê xwarin dan, di lexema tûwaletê de sekinandin, xistina hawûzê gû (Hawûzek ji piştiya gû dabûn çêkirin û mirov berê di wir de dihat şusîn), xistina jop û bi zimana paqijikirin, tazî li ser betonê bi daran lêxistin, bi zimana erd maltin, xwarina qalikê zebeş, peîêx, mandaşîn, porta-kal, keşala tirî û tiştên wek wan.

Mirovên ku ji bin çav derdiketin (cihê êskencê û tedayê) dişandan girtîgehê. Di girtîgehê da berê 40-50 roja girtî di hucra de dihate sekinandin. Rojêñ hucrê ji cihê êskencê zortir bû, mirov hezar xweziyê xwe bi cihê êskencê dianî. Wextê mirov di bin çav de ye, her wext çûna girtîgehê di bîra mîrov de ye. Mana hucra xwestina kowûşa tîne ber çav, li pişti dîtina kowûşa, mirov dixwest dîsa biçûya bin çav. Bi rastî girtîgeh ji cihê bin çav geleki zortir bû. Bi awakî gjî û bêhes mîrov dihate girtîgehê, di hatina girtîgehê de gardiyan (zabit) direvyan

pêsiya mirov û digotin:

-Oooooo pismam! Hûn bi xêr hatine, ser çavan hatine, wax wax ker kurê kerê polîsa hûn xistin halekî ne baş û hûn gelekî gemarî ne wax, wax, wax, . . Kincê xwe derxînin emê we bibin hamamê. Pişti van gotinêñ wan ï nerm, mirov digot qey rast dibêjin. Me hema dest bi derxistina kinca dikir û hew derpî li ser me dima.

Gardiyan awirek sert dida me û digotin:

-Derpiyêñ xwe ji derxînin, ji bo hûn karîbin baş xwe bison. Piş wan gotinêñ wan ï sert mirov fam dikir ku waziyet nebaş e, lê em meçbur bûn wek wan bikin û me derpiyê li ser xwe derdixist (Ji bo jin û mîr ferq tunebû). Piş derxistina derpî ji, em dibirin dixistin hawûza gû. Piş vê şuştina "delal" mirov li ser betonê dirêj dikirin û bi dara bi canê mirov dike-tin, heta derek yekî nehata şikestin wan dev ji wî bernedidan. Dûre em dixistin huera û heta me di wir da marş ezber nekira, em nedîsandin kowûşê. Ji bo vê yekê di ezberkirina marş de me pir acele dikir. Çûna kowûşê rezaletekî din bû. Mirov xwe ji huera heta kowûşê bi erdê re kaş dikir.

Ev tenê "xêrhatina" girtîgehê bû. Piş "xêrhatinê" ci dihate serê me, hûnê di hejmareke din da bixwînîn.

KULTURFEST
FÖR FRED OCH SOLIDARITET

SEVA CANDE
BO PIŞTGIRI
Ü ASİTİYÊ

Kurdiska och
Svenska artister
Artisten Kurd
ü Swêdi

Dato: 22 maj
Tid: 19.00 - 23.00
Plats: ABF, Blåsalen Kommunalväg 26
Cih: Huddinge

Pendelbåt från Stockholm mot Söderåsle - Avgång Huddinge
Buss 720 från Västby Gård och Flitja Centrum
Arr: Kurdiska föreningen i Huddinge (Komitea Kurd Li Huddinge)
= Huddinge Fredskommitté (Komite Asîti Li Huddinge)

Evîndarê mirovatî û şairekî şoresger

Mayakowsky



Di civinekê de helbestên xwe dixwend. Ji nav besdara yekî rabû û qiruya; "bese, bese helbestên te ne hêjaye pênc qırışan e, tim qelsin û wê sibê bûne ji bîrkirin". Mayakovsky keniya lê vegerand û got: "Ji kerema xwe re 1000 sal şunda were cem min, emê wê çaxê bibînin". Rastiya tarîxa edebiyata dinê nîşan da ku wê helbestên wî bi hezar salan bijin, qedir û rûmetên xwe jî wê biparêz in.

Mayakovsky di naw şairên dinê de gîhişt merhalekê wusa bilind ku, heta nuha pir kêm şair gîhiştine wê merhelê. Mayakovsky di sala 1883 de di gundekî Gurcistanê de hate dinê. Di sala 1906 de bavê xwe wenda kir û bi diya xwe ve barkirin çûn bajarê Moskovayê. Li wir Mayalowskî rastê bolşevikan hat û bi wan re têkili danî. Sê caran ji aliyê polîsên Keyser hate girtin. Piştê ji zîndanê derket dev ji siyasetê berda. Bi hunermendiyê ve mijûl bû. Wê çaxê rastê David Burljuk hat. Ev rasthatina jiyana şair ji binî

ve guherand. Her du heval bi hevdû re kar kirin û bûn mesûlê ekoleke nû, FUTURIZM.

Futurizm di wan çaxan de ekoleke nû bû. Her wekî ku tê zanîn futurizm di sinnet û edebiyatê de rojên pêş diarmancîne (armancı dike), rêya rojên nû xebat û heviyê nişanê mirovan dide. Dîsa li gor fîkrîn wan divê sinêt û edebiyat çarçowa aristokrasîyê bişkêne û di nav gel de bela bibe. Mayakovsky û hewalêna xwe ber bi vê armancê meşyan. Li welatê xwe bajar bi bajar, gund bi gund geriyan. Di bajaran de li ser makînan û karkeran, di gundan de li ser gundiyyêneşar xebitîn.

Piyes nişan dan, helbestên xwe xwendin û di demeke kin de, li her aliyeñ welêt xwe dan nasin. Ew xebata wi ya hêja nasîna fikir û nêherîna wî jî bi hevre anî. Edî karker û gundiyan li rojên pêş xwe bi hêvî, bi bawerî mîze dikir û bi vî awayî dijîyan. Em dikarin bibêjin ku ev xebata Mayakovsky bi rêya edebiyatê, karker û gundişîyar dikir û dikişand nava tevera siyasi. Ji xwe ji ber wê yeke di dinê de jê re şâîrê Şoreşa Oktober te gotin.

Di wê demê de li Rusyayê ji bo nan, azadî û sosyalîzmê şerekî dijwar hebû. Di wî şerî de wî li cem karker û gundiyyêneşar cihê xwe girt. Li hemberê zor û zulma Keyser liberxwe da. Nemaze li dijî sansûra Krneskî (serokvezîrê berî Şoreşa Oktober) tekoşîneke pir tûj meşand, car caran ket nava tewren anarşisti jî.

Piştî Şoreşa Oktober di redaksiyonâ Lenîn de cih girt. Lê şair ji wazîfa xwe ya nû zêde kîfxweş nebû, û ji demekê şûnde jî dev ji wazîfa xwe berda. Di sala 1921 de helbesta Şoreşa Oktoberê nivisi.

Di destêkê de Mayakovsky di bin tesîra Futuriste Italianî Tommaso Marinetti de mabû. Le di demek kin de hostayê xwe li paş xwe hişt, huner-

mendî û serketina wî be sînor li tevâyiya dinê below bû. Di vê serketina Mayakovsky de tesîrê klasikên rûs pir mezin in (Dostoyewskî, Gogol, Çehov hwd.). Hevalê wî yê Lillî Bar-kus di bîranîna xwe de "Mayakovsky ewindarê, Dostayewskî, Gogol û Çehov bû, wextên xwe yên vala bi xwendina pirtûkên wan derbas dikir" dibêjê.

Mayakovsky di edebiyata rûsî de, rönensansekî nû çêkir. Di nabeyna edebiyata kevn (klasik) û ya nû (modern) de pireke gelek xurt ava kir. Li dû Mayakovsky gelek şairên ciwan di şopa wî de meşyan û afiran-dinên gelek giranbuha nivisîn. Nazim Hikmet, şaire tirk mînakekî ji wan e.

Mayakovsky mîna ku li ser karker û dinêkî nû nivisiye, her weha li ser evîn û evîndariyê jî gelek eserên wî hene. Li ser şanogeriyê (tiyatrosu) jî xebate wî heye û sê piyesen hêja nivisiye. Tew di piyesekêde bixwe jî wek aktor cih girtiye. Serketina Mayakovsky ne tenê li ser şî'ir û tiyatrosu ye. Ew bi resim (hunermendî) û karîkatûrî ye ve jî mijûl bûye.

Di jiyana xwe ya 47 salî de nav û dengê xwe di tewayiya dinê de da nasin. Li Parîs, Newyork û Berlinê konferans da. Li bajarê Berlinê kovarekî bi zimanê rûsî derxist. Li Parîs rastê keçekî rûs hat û dilê wî kete wê. Le keçik bi yekî dinre zewicî. Vê bûyerê li ser jiyana wî tesîrekî mezin danî. Ji demekê şûnde jî nexweşîyeke asabî lê peyda bû û di sala 1930— de bi xwe xwe kuşt.

Belê Mayakovsky iro ne di nav me de ye. Lê wî di jiyana xwe ya kin de ji edebiyata dinê re kaniyeke wisa zelal û xweşik hişt ku, iro di her welatê de bi dehan şairên ciwan ji ava vê kaniyê wedixun.

Battal Ezîz

ŞANÊN NÛ WEŞANÊN NÛ WEŞANÊN NÛ WEŞAN

Melayê meşhûr

Pirtûka "Melayê meşhûr" a seyda-yê M. Emîn Bozarslan, li bajarê Uppsalye- li Swêdê hatiye weşandin. Pirtûk ji qalibê mezin e û ji 85 rûpelan pêk hatiye. Di navbera rûpelekî û rûpelekî de, xwendevan pêrgî xalîçen Siyabendê hunermend, dîbin. Bi vî awayî kitêb bi rengekî spehî xwe dide xwiya kirin.

Ji bili van tiştan, seydayê M. Emîn Bozarslan bi firehî pêşgotinek ji kitêba xwe re nivîsiye. Em dikarin bibêjin, ku li pêşgotin lêkolînek zanistî li ser Melayê Meşhûr e.

Béguman pirtûka "Melayê Meşhûr" defîna meselok û serpêhatiyê kurda ye û xwendina wan me vedige-rîne heyamî sêvbêrkên odan li welêt.

Jîn

Dawiya sala 1986-an, kovara "Jîn" cîldê III-ya jî hate weşandin. Weka em dizanîn "Jîn" kovareke kurdî bû, bi tîpên erebî û bi zimanê kurdî û tir-kî li Stenbolê, dihate weşandin. Hîn di cîldê yekem de, seydayê M. Emîn Bozarslan bi firehî di pêşgotina xwe de li ser "Jîn" ê rawestiya bû. Ji ber vê yekê cîldê II û III tenê orjinal û wergera seydayê M. Emîn Bozarslan pêk hatiye.

Helbet ev karê ha karekî giranbiha ye û bi saya danhevdan û wergera "Jîn"-ê ve, xwendevan dikare perçak ji dîrok û esera miletê xwe nasbike.

Elîf û bê

Bi navê "Elîf û bê" pirtûkek bi tîpên erebî ji du cîldan ji bo fêrbûna zimanê kurdî-zaravayê soranî li Parisê hatiye çapkirin. Weku di pêşgotina kitêbê de hatiye, ew ji aliyê "Komîsyona fêrkirdin û barhinanî komele" hatiye weşandin. Pirtûk bi xwe ji bo zaroka ye û rûpelen wê bi wênan hatiye xemilandin. Lê ji bilî zarokan, merovênu ku tîpên erebî nenasin, dikarin bi riya wê fêrî xwendina zaravayê soranî bibin.

Stokholmê te çi dîtiye bêje

Di meha cuŷî de çirokek dirêj bi navê "Stokholmê te çi dîtiye bêje" çap bû û gihiş destê xwendevanê kurd.

Nivîskarê çirokê Bavê Nazê di pêşgotina xwe de "Bi kuştina Olof Palme, em kurd ji du aliyan ve êsiyan" dinivîse û didomîne "bi taybetî vî tişî hişt ku ez êş û tada ku gêhîst me, derxînim ji der ve. Vê êşê, wilo xwe da

dilê min û min nikarî bû gotina xwe negota. Min gotina xwe netenê bi qêrîni got. Heya ji min hat, min xwest perçak ji kultura kurd ci baş û ci xirab bi riyalîtêtek objektîfi, di hinek qeh-remanen çirokê de gewde bikim..."

Hevalên ku dixwazin, dikarin vê pitûkî li Federasyonê bikirin. Buha-yê wê 35 kron e.

ERZANI

21 pirtûkên zarokan (bi çapake rengîn û bedew tevî heqê postê) 350 kronê swêdî (100 DM)

- | | |
|---|---|
| 1-Alfons û cinawir
<i>Gunilla Bergström</i> | 12-Kino digot, alîkarî bikim
<i>Inger & Lasse Sandberg</i> |
| 2-Keça serrût Lotta
<i>Astrid Lindgren</i> | 13-Alfonsê şît
<i>Gunilla Bergström</i> |
| 3-Pippi ya goredirêj
<i>Astrid Lindgren</i> | 14-Gava Rindikê dixwast şûmiyan bike
<i>Astrid Lindgren</i> |
| 4-Belê Lotta kare bajo
<i>Astrid Lindgren</i> | 15-Kî Alfons rizgar dike?
<i>Gunilla Bergström</i> |
| 5-Ma tu tîrsonekî Alfons ?
<i>Gunilla Bergström</i> | 16-Sampo Lapecan
<i>Z. Topelius & V. Leo</i> |
| 6-Binêre Madikan berf dibare
<i>Astrid Lindgren</i> | 17-Pisingê ku wenda bû.
<i>M. Ekström & P. Pettersson</i> |
| 7-Ma gakûvî kûçikan dixwin ?
<i>Lennart Frick</i> | 18-Kundirê helez
<i>L. Hellsing & S. Otto S</i> |
| 8-Arhuaco-Sierra Nevada
<i>Bengt Arne Runnerström</i> | 19-Bavo, were derive
<i>Inger & Lasse Sandberg</i> |
| 9-Şevbaş Alfons Aberg
<i>Gunilla Bergström</i> | 20-Şûmiya Zîrek ya hejmar 325
<i>A. Lindgren & B. Berg</i> |
| 10-Emîl, mîha nîvçe
<i>Petra Szabo</i> | 21-Kela jînê
<i>Veronica Leo</i> |
| 11-Kino digot, li wê derê binêre
<i>Inger & Lasse Sandberg</i> | |

Bûhayê van pirtûkên jorîn bihevre 750 kron (215 DM) e. Hûn dikarin bi 350 kronî an 100 DM-i bikirin.

Navnîşana Weşanxanê:

Kurdiska Kulturförlaget
BOX 161 39
103 23 STOCKHOLM / SWEDEN
Postgiro: 79 05 24 - 3
Bankgiro: 137 - 8538 (Första Sparbanken)

هەرەوەزى يە ئەۋەش تەنیا بە يەكگىرتىن دەبىت!!.

ھونەرمەندى رىيژسیور ماوهى سالىتكى زىاترە لە سوئيد دەزى و گەلىتكى پە يوھەندى لەگەل برايانى ھونەرمەند و چەندان كسى وولات پارىز كردووه، ھەر لە پىتاوايى ئەۋەش بىتوانى فيلمىتكى بەمەمم بېتىنى.

وەلىنى تاكو ئىستا نەگە يشتۇتە هىچ ھىۋايەك بۇ ئەۋەش بىتوانى خزمەتىك بگەيەنى بە نەتەوهەكى.

ئەگەر بىتىو كارى بۇ ئەنجام بىرىت لەوانە يە بىتوانى خزمەتىك بەگەلى كورد و سينەمايى كوردى بکات لە دوورە وولات.

ھەر خۆى دەبىزى:

(كارى سينەمايى بۇ گەلى كورد ئەپرۇ لە دوورە وولات وەكىو بۇمبایەك وايە دۇ بە دۈزمنان و داگىيركەرانى كورستان، بۇ راستى و ئىسپات كودنى ئەو مەسىلە يە... ھونەرمەند و رىيژسیورى هيڭامان (يىلماز گۇنى) يە كە بە بەرەھەم ھونەرييە مەزنەكانى شۇرۇشىنى گەلىتكى مەزنى بەرپا كرد دۇ بە داگىيركەرانى كورستان و جىيەنانى ئاگادار كرددەوه، نەتەوهە كورد نەمردۇوه و ھەر دەبىت وولاتەكى «كورستان» پىزگار بىي... ھيوادارم ھونەرمەندى رىيژسیورى سينەمايى كاڭ (اسەمان فايق) لە داھاتودا بىتوانى خزمەتىك بە سينەمايى كوردىيمان بکات و كاروانى ھونەرى كوردىيمان پىتر بەرەوبىتىش بەرىت..



لەم بەرەھەمى دا تەنیا يەكىتكى لە ئەكتەرە كانى كورد بۇوه بەلام ئەوانى تۇ زۇر بە يان ھونەرمەندانى رۇمانى بۇونە و زۇر بە رىيکوبېتكى و بەشىتىوھە كى كىوردەوار يان دەورىان بىنیووه.

ئەم بەرەھەم لە چەندان ۋىستەفالى ھونەرى بەشدار بۇوه لە ۋىستەفالى لاوان لە لەندەن لە سالى ١٩٨٠ دا بەشدار بۇوه و خلااتى دووه مىي وەرگەرتۇوه.

ناوهەپۈكى فيلمەكە باسى بەسرەتى نەتەوهە كورد دەكەت لە سەر تاسەرى كورستان وەكىو نەتەوهە يەكى ڈىر دەست و ولاتىكى دابەش كراو، بىيچەك لەۋەش نەتەوهە كورد بەرددەۋامە لە چەۋسانەوهە چىنایەتى بە دەست دەرە بەگىايەتى لە كورستاندا، واتە نەتەوهە كورد بە دوو جۇر دە چەۋسەتىتە و چىنایەتى و ڈىر دەستى.

لە فيلمەكە يەدا وادەرددەكەوى كە كورد نەتەوهە يەكە تاكو بەدەستى خۆى، خۆى ئازاد نەكەت پىزگارى نابى لە مەسىلەي نەتەۋا يەتى و چىنایەتى. ئەمە ناوهەپۈكى دوا بەرەھەمى ئەم ھونەرمەندە بۇوه.

ئەم ھونەرمەندە مەزنە لە مىئۇوى ھونەرى كوردى جىيگائى دىيارى كراوى هېي و نابىت لە ياد بىرىت و خاوهنى توانا يەكى مەزنە.

دە توانى گەلىتكى كارى سينەمايى لىسوانە مەزنتىريش بە بەرەھەم بېتىنىت، ئەگەر ھاوکارى هەبىي و پېشتىگىرى لەن بىرىت.

ھەر خۆى دەبىزى:

(باشتىرين چىپرۇكۇ سیناریوم ئامادە كرددۇوه كە باسى كارەساتى ئەپرۇزى كورستان دەكەت بەلام گەلىتكى ھولم داوه بۇ ئەۋەھى بە بەرەھەمى بېتىنم. لەن مۇخابىن و داخى گرائم ھىچم بە هىچ نەكىرددۇوه، چۈنكە ئەگەر نەتەوهە كەم ھاوکارىم نەكەت چۈن بىتوانم كارى ھونەرى بە بەرەھەم بېتىنم، بە تايىبەت كارى سينەما كارىكى ئەۋەندە سوك و ھاسان ئى يە، ماندۇو بۇون و ھاوکارى پىويىستە، ھەروھە ئەنجامدانى كارى ھونەرى، كارىكى

بەردەوام بۇوه، ھەر لەپەرئەم کارە ھونەرىيە لە ناوه پاستى سالى ۱۹۷۴ سەھەرى كىردووه بۇ رۆمانىيا، بۇ پەرەپىدانى ھونەرە كەى لەبەشى سينەما دەستى كردووه بە خويىندىنى بالا، و بە پلەي ماجستير و لە سالى ۱۹۷۹ لە شارى بۇخارست خويىندىنى تەواو كردووه. بەلام ھېچ وازى نەھىناوه و ھەرچەند تەنگ و چەلەمەي ھونەريشى بۇ ھاتقۇتە پېشەوه وەلىنى كارى خۆى بەردەوام پىداوه و كۆسپ و تەگەرەي لەسەر رىگاي ھونەرى خۆى لاداوه و زۇر بە دىلسۆزىيەوه كارى كردووه لەم رىگايىدا.

زۇريش دىلسۆز بۇوه بۇ ھونەرى نەتەوه كەى، ھەر بۇيەش بە ھاركارى چەندان ھونەرمەندى رۆمانى توانىيوبىتى چەند بەرھەمەتكى سينەمايى بە بەرھەم بەھىنەت. دوowan لە بەرھەمەكەنلى بە زمانى كوردى بۇونە و ئەۋى تۈريان بەپوسى بۇوه. لەم سى بەرھەمەدىدا چەندان خەلاتى ھونەرى وەرگرتۇوە ج لە رۆمانىيا ج لە ۋىيەتىڭلى لاوان لە چەندان وولاتانى تر.

يەكمە فىلمى كوردى بە تىيى «كە شە داھات دەپۇم» دەرھەنەواه و كە ھەموو ئەكتەرەكەنلى رۆمانى بۇون. بەلام لە قالبىتكى كوردهوارى يانەي جوان بە بەرھەمەي ھىناوه و سەركەوتى لەم رپووه و بە دەست ھىناوه. دوا بەرھەمە لە سالى ۱۹۷۹ دە ئامادە كردن بۇو بە تىيى «ھەلاتن» كە لە ئامادە كردن و سینارىيۇ و دەرھەنەنەي كاك سەمان خۆى بۇوه، درېئى فىلمەكە زىياتر بۇو ل ۹۰ دەقىقە، بەلام حکومەتى رۆمانى زۇربەي دىمەنەكەنلى لى بېرىپە، لەبەر ئەۋەي باسى بەسەرەتاتى نەتەوه يەكى ڈىر دەستى دەكەد لە ئەنجامدا تەنبا ماوهى درېئى فىلمەكە ۱۸ «دەقىقەتى لى ماوه تەوه، لەگەل ئەۋەشدا توانىيوبىتى ھەر سەركەوتى بەدەست بەھىنەتى و چەند پۇزىتكە لە يەكى لە سينەماكەنلى بۇخارست نىشان بىدرى.

سینەمايى لە تەلەفزىيەن تۆماركەد، كە بۇ يەكمە جار چىرۇكىيە كوردى بەم شىيە يە پېشىكەش بىرىتىت و گەلەتكە سەركەوتى بە دەست ھىنا لەپۇرى ھونەرىيەوه.

۸) لە سالى ۱۹۷۲ دا جار ئىكى تە دوو شانۆگەرى ترى پېشىكەش كرد بە ھاواكارى قوتاپى يەكەنلى قوتاپاخانى ئامادە يى چەمى رېزانى كچان، شانۆگەرى كان «برىستىتى» و شانۆگەرى «خېزانى شەقاو» بۇون، ئەكتەرەكەنلى برىتى بۇون لە كېچە كورد.

۹) لە سالى ۱۹۷۴ دا لە ۋىيەتىڭلى ھونەرى يەكمە كوردى لە بەغدا، شانۆگەرى



«تەقىنەوە» يەپېشىكەش كردووه كە لە كارە ھەرە مەزنەكەنلى دەزەپەندرىتى، كەوا بۇ يەكمە جار ھونەرمەندى رېژىسيئەر كاك «سەمان» هەندى بىنراوى سينەمايى تىكەل بە شانۆگەرى كە كەد بۇو و زۇر بە شىيە يەكمە سەركەوتىو ئەم بەرھەمەي پېشىكەش بە جەماوه رى ۋىيەتىڭلى ھونەرى يەكمە كوردى كردووه لە بەغدا.

ئەۋەي شايىانى باسە ھونەرمەندى ناوبر او خەلاتى يەكمە وەرگرتۇوە. ھونەرمەند «سەمان فايىق» لە سەركارى ھونەرى خۆى

ئاماده کردنی
فەخرەددىن گەردى
١٩٨٦/١٠/١٢ سەۋكەۋلۇم

ھونەرمەندى كورد

سەلمان فايەق



و ئەكتىرەكانى (چەللىل زەنگەنە و چىنور
ئەممە) و ھەندىيکى تىرى بۇون .
ھەروەھا لەگەل شانۆگەرى «خاکەكەم» يى
دەرھىتىاوه بۇ سەرشانۇ و بە بەشىدار بۇونى
ھەمان كۆمەل .

٤) شانۆگەرى «پېش مەرگە» لە ئامادە كردىن
و دەرھىتىانى «سەلمان» خۇى بۇون، لە شارى
كەركوك لە سالى ١٩٧٢دا پېشىكەش كراوه .
٥ لە سالى ١٩٧٢ شانۆگەرى (بەھارى
دۈراوايى لە سەر شانۇ پېشىكەش كردوو، لە
سالى ١٩٧٢دا لە تەلەفزىيۇن تۇمارى كردوو،
٦ لە سالى ١٩٧٢دا لە قەزاي چەمچەمال
شانۆگەرى [٢-٢] يى بەپۇنهى نورۇزە و
پېشىكەش كردوو، لەھەمان سالدا شانۆگەرى
«شۇرىشى نورۇز» يى پېشىكەش كردوو كە لە
نووسىنى چىرۇك نووسى نەمە لەتىف شىيخ
حامد بۇو، لەھەمان سالدا لە مانگى نىساندا
شانۆگەرى (تىكۈشانى مەرۆف) اپېشىكەش بە
خەلکى ناوجى (قدەھەنجىر) كردوو .

٧ لە سالى ١٩٧٢دا چىرۇكى «مەرەزە» يى
بەشىوە يەكى گەلتىك مۇدرىيەن و وەك فيلمىتىكى

ھونەرمەندى كورد «سەلمان فايەق»
لە سالى ١٩٤٥دا لە كوردىستان لە شارى
كەركوك لە دايىك بۇون، هەر لەھى خوتىندىنى
سەرەتايى و ناوهندى تەواو كردوو و چۈتە
ئامۇرۇڭارى ھونەرە جوانەكانى بەغدا و بەشى
شانۇ خوتىندىوو .

ئەم ھونەرمەندە گەلتىك بەرھەمى ھەيە كە
جىيگايىكى ديارى ھەيە لە كاروانى مىزۇوى
ھونەرى كوردىماندا، وە زۇرېبى ھەرە زۇرى
بەرھەمەكانى لە سەر شانۇ لە زۇرېي شارەكانى
كوردىستان پېشىكەش كردوو، بىيىجە لەوانەش
ھەندىيک شانۆگەرى بۇ تەلەفزىيۇنى بەشى
كوردى لە كەركوك تومار كردوو .
بەرھەمەكانى :-

١) شانۆگەرى «دايىكى شەھىد» يى لە سالى
١٩٧٠دا، تىپى «مەشخەل» لە شارى كەركوك
پېش كەشى كردوو و لەھەمان سالىشدا لە
سلىمانىيىش پېشىكەش كراوه، ئەم شانۆگەرى يە
لە نۇرسىنىي مستەفا پەزار و دەرھىتىانى بۇ سەر
شانۇ كاك «سەلمان» بۇون .

٢) شانۆگەرى «كۆتايى دەرەبەگ» يى لە
سالى ١٩٧٠دا لە شارى كەركوك پېشىكەش
كردوو و ھەروەھا لە سلىمانىيىش دۇوابارە
پېشىكەش كراوه تەۋە .

٣) شانۆگەرى «يەك» يى لە نورۇزى سالى
١٩٧١دا پېشىكەش كردوو و ئەكتىرەكان
(غەنۇور عوزىرى، مەحەممەد رەھمان، پەروين
ئەممە، نەجييە) بۇون . ھەر لەھەمان سالدا
شانۆگەرى «ڈيان... يان كچە لالەكە» لە
نووسىنىي چەللىل زەنگەنەيى دەرھىتىاوه

ئەم سال هەموو پىيکەوه جەزنى نەورۇzman پىرۇز كرد

ھەموو تىكىپا بۆکوردستان...!
بەلىٰ ئەمسال لە ڈىير ئالاي كوردستان و بە دروشمى «ئىيمە پىيکەوه بەھېيزترين» جەزنى نەورۇzman پىرۇز كرد، پىتر لە ھەزار مەۋھى كورد لە ئاهەنگى شارى ستۆكەھۇم ئامادە بۇون و ھەروهە لە ھەموو شارە كانى ترى سويد، شايىھى نەورۇز سازكرا، و لەوتىش كورد سەرچۈپى رەشبەلەكى كىشا، ئەمسال گىرى نەورۇزى كورد بە خويىنى پىيشىمەرگەي ئازا خوش كرا، ھەر بۆيىش جەزنى نەورۇز لە كورد پىرۇز كرا.

نەورۇزان پىرۇز ئەي پۇلە ئازاكانى سەنگر و خبات و نەسرەوتىن «ئىي پىيشىمەرگە» نەورۇزان پىرۇز ئەي دايىكى شەھيدانى پىنگاي پىزگارى و سەرفرازى كورد و كوردستان، نەورۇزان پىرۇز مندالانى شەھيدان، نەورۇزان پىرۇز ئەي رۇزى دەربىدەر و ئاوارەكانى گلى كورد.

نەورۇزى ئەم سال نەورۇزى يەكىرىتى، ھىوا دارىن نەورۇزى سالى داھاتوو، نەورۇزى سەرەخۇيى و سەرفرازى بى بۇ نەتەوە كەمان...!

شايىھى نەورۇز سازكرا، كورپ و كىيژۇلان ھەلبەزىن، سەرچۈپى كىشا، سەرچۈپى رەشبەلەكى كىشا، دەستى دۆى ناسك و نازدارى يارى شۇغ و شەنگى خۇي گوشى، زۇرىشى چاولە كىيژۇلە كوردان داگرت، كورپگەلى ئەقىندار بە چاولە دوورەوە دولبىرى خۇي ماج كرد، بەتىلاك خوار كەدنى جەمدانى سەرى سلاوى بۇ كىيژۇلان بەرى دەكرد.

«دەلال» ئى گۇرانى بىزى كچە كورد، ھاتتو گۇرانى چىرى و چرىيكاندى ھەروه كۆ بولبۇلى شەيدا، نەورۇزى پىرۇز كرد لە ھەمووان. ھەينىدەپىن نەچوو كىيژۇلە دىاربەكلىان چراي نەورۇزيان داگىرساند و سەرچۈپى كىشا، سەرچۈپى كىشا، ھۆلى ئاهەنگ لەگەن دەنگى چەپلە پەيزان زىزمى لىنى ھەلسا.

چوان حەچۈرەن بەدەنگ بە سۆزەكىي نەورۇزى پىرۇز كرد، ئەو ناوهى جوشدا بە سەتران، گۇيىچەكى دوڑمنانى كوردى كەر كەر، ھاوارى لىنى ھەلسا و گۆتى: نەز بۆچى دەرىم؟



UTGIVAR KORSBAND

BERBANG

BOX 45205, 104 30 Stockholm

B FÖRENINGSBREV

Sidik Bozaslan

Faringep 1, 30, 2tr.
163 61 Spånga



1 GULAN

MÄR

